Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1366 | 8-Nîsan-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# 7’ê Nîsanê Roja Tenduristiyê Ya Cîhanî

**Esmehan Gedro/Qamişlo**

**Roja Tenduristiya Cîhanî her sal di 7’ê Nîsanê de tê pîrozkirin. Di vê rojê de li ser tenduristiya mirovan çalakî û semîner li ser asta cîhanê tên lidarxistin.**

Di sala 1948`an de, yekem Meclisa Tenduristiyê ya Cîhanî ji bo bîranîna damezrandina Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê daxwaza nîşankirina “Roja Tenduristiyê ya Cîhanê” kir. Ji sala 1950`an vir ve, roja Tenduristiyê ya Cîhanê her sal di 7`ê Nîsanê de tê pîrozkirin. Her sal mijarek ji bo roja Tenduristiyê ya Cîhanê tê hilbijartin. Mijar her sal diguhere, mijarên berê vegirtina tenduristiya gerdûnî, depresiyon û mijarên din ên ku girîngiya aboriya tenduristiyê di hêsankirina gihîştina xizmetên tenduristiyê ji bo hemî beşên civakê de, di heman demê de hişyariya li ser tenduristiya jîngehê jî zêde dikin, vedihewîne.

### Çima Roja Tendirustiyê ya Cîhanê tê pîrozkirin

Bilindkirina hişmendiyê li ser girîngiya pêşîgirtina li nexweşiyên cûrbecûr û pêşvebirina tenduristiya giştî ji bo hemî mirovan. Ronîkirina pirsgirêkên tenduristiyê yên ku civakên li çaraliyê cîhanê pê re rû bi rû dimînin û destnîşankirina nexweşiyên berbelav. Xurtkirina hewldanên navneteweyî û herêmî ji bo bidestxistina pergalek tenduristiyê ya çêtir bi rêya têkiliya bi pisporên tenduristiyê re. Herwiha civakan di warên vegirtina tendirustiya gerdûnî, kontrolkirina nexweşiyan û şêwazên jiyana tendirust de werin destpêkirin, ev roj tê pîroz kirin.

### Girîngiya roja cîhanî li ser tenduristiya mirovan

Balkişandina li ser mijarên krîtîk, her sal mijarek taybet a tendirustiyê wek nexweşiyên dil, tendirustiya derûnî, an nexweşiyên vegirtî tê hilbijartin da ku balê bikişîne ser pirsgirêkên herî girîng ên wê demê. Divê civak xwe ji tiştên ku zerarê digihîne tendirustiya wî/wê biparêze. Armac ew e ku mirov hînî awayên parastina ji nexweşiyan bibin û girîngiya jiyaneke bi tendirust û parêzeke baş fêm bikin. Têkoşîna li dijî newekheviyê yek ji armancên sereke kêmkirina ferqa di navbera welatên dewlemend û xizan de ye, da ku xizmetên bijîşkî bi awayekî wekhev bigihêjin her kesî.

### Nêzîkatiyên bijîşkan li ser kesên nexweş

Nêzîkatiya bijîşkan a li hember nexwaşan ne tenê peywirek pêşeyî ye, lê bingeha başbûna nexweş bi xwe ye. Ji bo têkiliyeke saxlem, dive bijîşk bi vî awayî tevbigere. Divê êş, fikir û rewşa derûnî ya nexweş fêm bike. Tevgera bijîşk li ser kesê ku nexweş dikeve gelekî girîng e dive bi zimanekî xweş bi wî/wê kesên nexweş re bi taybet kesê bi temen mezin re baş tevger bike.

### Divê civak çawa xwe ji nexweşiyan biparêze?

Gerek mirov xwe ji tiştên ku zerarê digihîne laş xwe biparêze. Dive parastina tendirustiya xwe ji xwarinên ku ji laş re zêde ne baş be nexwe û her tim derdora mirovan paqij be, ji ber ku tendirustî li ser civakê roleke mezin dilîze. Xwe ji çixareyê û vexwardeyên bi zerar dûr bixe.

### Amûrên rêxistina tendirustiyê ya cîhanî

Amarên Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê ji bo sala 2025`an nîşan didin ku li seranserê cîhanê bi qasî 20 milyon bûyerên nû yên penceşêrê û 9.7 milyon mirin çêbûne, û tê payîn ku heta sala 2050`an ev hejmar bigihêje 35 milyonî. Penceşêra pişikê nexweşiya herî kujer û gelemper e, û cixarekêşandin û faktorên hawîrdorê sedemên sereke dimînin.
Penceşêrên Herî Belav, Penceşêra pişikê, di cîhanê de hem di teşhîs (2.5 milyon bûyer) û hem jî di mirinan de pêşeng e (1.8 milyon bûyer). Penceşêra memikê, di nav jinan de herî zêde tê teşhîskirin. Penceşêrên din, Penceşêrên kolon û rektûmê, prostat û mîdeyê.




Pêşbîniyên Pêşerojê, tê payîn ku rêjeya penceşêrê heta sala 2050`an %77 zêde bibe, û li welatên kêm dahat û navîn zêdebûnek zûtir çêbibe. Faktorên Rîskê, Ji %40 zêdetir mirinên ji ber penceşêrê ji ber faktorên pêşîlêgirtinê yên wekî cixarekêşandin, xwarina nebaş û vexwarina alkolê ne. Penceşêr di Ciwanan de, rêjeya penceşêrê di nav kesên di bin 50 salî de di sê dehsalên borî de bi qasî %80 zêde bûye.

### Rêjeyên Jiyan û Mirinê

Rêjeyên jiyanê li gorî celeb û qonaxa penceşêrê pir diguherin, û rêjeyên jiyanê ji bo penceşêrên wekî penceşêra pankreas û kezebê pir kêmtir in.Tesbîtkirina zû û dermankirinên nûjen rêjeyên saxmayînê, bi taybetî ji bo pençeşêra pêsîr û prostatê, baştir dikin.

**Bi kamîreya Ayşa Silêman**



## FERHENGA BIWÊJAN

**Keda Xelef çû bertelef:**
- Keda hatî dayîn tev ket avê; ji kar û xebata hatî kirin ti encam nehat girtin.

**Ker bi ajotinê diçe:**
- Bi ked û xebatê tişt dibin.

**Kesê mino destê mino:**
- Mirov ji xwe re neke ti kes ji mirov re nake.

**Kî ji dê ket û nav pê ket?**
- Bi ked û xebatê navê mirov derdikeve, kesê hema ji diya xwe bibe nav pê nakeve.

**Min xwîna xwe pê re vexwar:**
- Ez di ber wî karî de pir êşiyam.

**Mirîşkê hêk kir heval ji xwe re çekir:**
- Kesê xwedî ked û berhem be dost û hevalên wî çêdibin.

**Morî hinge çil carî li xwe hildigire:**
- Divê mirov li ber xwe bide; divê mirov kedê bide, bê ked nabe.

**Ne esil kil û kildan e, esil teşî û badan e:**
- Ya girîng ne xwexemilandin û xwexweşikirin e, ked û xebat girîng e.

**Nan ji baniya av ji kaniya:**
- Bê ked dijî; li ser keda xelkê dijî.

**Ne ker li garan e, ne pirsiyar li gavan e:**
- Ezê karê xwe bixwe bikim; pêwîst nake ez serê xwe biêşînim.

**Pars kir ji ber deriya da xêra miriya:**
- Bi heman wateyê.

**Pê re dibeze:**
- Hewl dide bi dest bixe; hewl dide bike.

**Piyawtiyê li ser ava hemamê dike:**
- Ji kîsî xelkê merd e; keda wî bixwe nîne, naxebite lê karê hina kirî çawa ku wî kiribe nîşan dide.

**Rûn li çirê ke, seyra malê ke:**
- Ku rûn di çirayê de hebe, wê ronahiyê bide; ku mesref li tiştekî bê kirin, xweş dibe.

**Stûna malê ye:**
- Karê malê tev li ser milê wî ye; karê girîng ew dike; ku ne ji wî be, wê rewşa malê nebaş be.

**Tif kir nava destê xwe:**
- Pir bikeyf û jidil dest bi karê xwe kir.

**Ti kes hêstirên mirov paqij nake:**
- Ti kes derdê mirov nakişîne.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Pêkanîna biryaran, têkoşîneke hevpar dixwaze’



Endama Komîteya Têkilî û Tifaqên Siyaseta Demokratîk a Kongra Star Ruken Ehmed diyar kir ku Konferansa 17'ê Adarê nîqaşkirina rewşa jin di entegrasyon û guhertinan de pêwîst bû, herwiha wê gelek xebat di asta Sûriyê û navnetewî de werin kirin...**R-2**

## Idrîs Henan: Çapemeniya Sûriyê di asteke xirab de ye




Hevserokê YRA Idrîs Henan diyar kir ku li Sûriyê rewşa çapemeniyê wekî hemû welatên Rojhilata Navîn di asteke xirab de ye ku mirov nikare behsa ragihandineke azad bike. Li Rojavayê Kurdistanê, rewş hinekî baştire ku rojnamevan dikarin heta astekî karê xwe bi serbestî bikin...**R-5**




## Li Kobanê tevî lihevkirinê, dorpêç û êriş

Rojnemevan Hêvîdar Heranî diyar kir ku dorpêça li ser Kobanê aloziyên mezin derxistin û wiha got: “Gelê Kobanê dixwaze bi xwaseriya xwe jiyan bike û mudaxeleyên ji derve, qebûl nake.” **R-7**



## Ji çiraxên hunera Kurdî

Hunermend Leyla Agirî; Stêrka Efrînê ya ronak ku ji salan ve şeveqa wê melûl nabe. Ew hunermendeke ku di pêlpêlokên dengê xwe de, bangên çiya, germahiya kelepûr û rastiya xweparêziyê hildigire ye.**R-9**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1366 | 8-Nîsan-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# ŞERÊ LI ROJHILATA NAVÎN ŞERÊ HEGEMONIYÊ YE

Berdevkê Dîplomasiya PJAK'ê li Ewropayê Zagros Enderyarî diyar kir ku şerê niha li Rojhilata Navîn tê meşandin şerekî pir alî ye û wê dewam bike, armanc jê diyarkirina hêza hegemon a nû ye. Erka PJAK'ê rêxistinkirin û parastina gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ye, herwiha bikaranîna derfetan ji bo pêkanîna demokrasî û azadiyê ji civakê re.**R-4**





## NATO ji damezrandinê heya gefên hilweşîna wê...

Temenê Hevpeymana Atlantîk ya Bakur (NATO) 77 sal in, ew hevgirtina siyasî-leşkerî ya 32 dewletên cîhanî ye. Piştî 77 salan di dema heyî de ku ji ber şerê Amerîka-Israîl li ser Îranê û nebeşdarbûna NATO di şerê li dijî Îranê de, Amerîka gefê li NATO'yê dixwe ku xwe vekişîne û di derencamê de were hilweşandin.**R-6**



**3 daxwazên Rêber Apo**
Farûk Sakik R-2



**Entegrasyon, di hişmendiyê de demokratîk dibe**
Dilyar Cizîrî R-6



**Diyardeya kuştina mirovan di civaka Sûriye de zêdetir dibe**
Ehmed Hesen R-7



**Gelo Aştî yan Şer?**
Gulîstan Xalid R-10

# ‘Pêkanîna biryaran, têkoşîneke hevpar dixwaze’

Endama Komîteya Têkilî û Tifaqên Siyaseta Demokratîk a Kongra Star Ruken Ehmed diyar kir ku Konferansa 17'ê Adarê nîqaşkirina rewşa jin di entegrasyon û guhertinan de pêwîst bû, herwiha wê gelek xebat di asta Sûriyê û navnetewî de werin kirin û got, “Têkoşîna ku tê kirin tenê ji jinên herêmê nayê xwestin, ev girêdayî rewşa hemû jinên di Sûriyê de ye. Divê em bi hev re bi têkoşîna jinên Sûriyê vî mafî biparêzin."

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Bi dirûşmeya “Werin em bi hev re têkoşîn bikin ji bo misogerkirina mafên jinan di destûra Sûriyê de” Kongra Star di 17 ’ê Adarê de konferansek li bajarê Qamişlo li dar xist. Di konferansê de semîner li ser mijarên siyaset, hiqûqî, parastin û entegrasyon nîqaş hatin kirin. Di dawiyê de encamnameya konferansê ya ku ji îradeya li wê derê pêşketiye, derket. Di derbarê mijarên hebûn û îradeya jin di Sûriyê de bi taybet di mijara entegrasyonê de, her wiha derbarî bendên ku di encamnameyê de derketine, Endama Komîteya Têkilî û Tifaqên Siyaseta Demokratîk a Kongra Star Ruken Ehmed ji Rojnameya me re axivî.

Ruken di destpêkê de bal kişand ser rewşa dawiyê ya ku tê jiyankirin û wiha bilêv kir: “Rewşa dawî ya geşedanên siyasî û leşkerî yên ku di giştî Rojhilata Navîn û bi taybet di Sûriyê de hatine rûdan, giştî rewş weke kirîzekê em dikarin pênase bikin. Bi taybet di nava van guhertinan de di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de guhertinên leşkerî û siyasî yên giştî hatin kirin. Di encama şerê ku li ser herêmên Rêveberiya Xweser de hatine kirin, gelek qurbanî û berdelên giran da û bi taybet gelek girtiyên me çêbûn.”

**‘Em di pêvajoya ji têkoşîna leşkerî ber bi têkoşîna siyasî dene’**

Ruken di berdewamiya axaftina xwe de hebûna jin di van guhertinan de ronî kir û wiha got: “Bi van guhertinan re em bi hev re ber bi lihevkirin û itifaqekê ve çûn, her çendî di bingeh de nerazîbûnên me hebin jî lê belê em di rewşekê dene ku ji têkoşîna leşkerî ber bi têkoşîna siyasî ve bimeşin dene. Di vê demê de me hewcedariyek dît ku em ji nû ve rewşên xwe yên rêxistinî û bi taybet ya jinan ber çavan re derbas bikin. Bi taybet ji dema hatina hikumeta demkî ya Sûriyê, me her sîstema xwe ya jin di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de parast, lê em weke parçeyek ji Sûriyê, herêma me niha gihîştiye rewşa entegrasyonê. Di vê rewşê de li beramberî me xeteriyên li ser jin derdikevin, xeteriyên li ser destkeftiyên jin hene û tên kirin. Her wiha jin di asta Sûriyê de xwe çawa bidin rêxistinkirin û têkoşîneke çawa bimeşînin û em çawa dest bi têkoşîna xwe bikin, wê gelek girîng be.”

**‘Di entegrasyon û guhertinan de nîqaşkirina rewşa jin, pêwîst bû’**

Ruken di domdariya axaftina xwe de behsa armanca ku konferansa 17’ê Adarê ê pê hatiye lidarxistin kir û wiha got: “Yek ji wan mijarên sereke yên ku di bernameya 8’ê Adarê de hatiye dayîn, gelek rewşên giran yên di herêmê de hebûn, belkî 8’ê Adara îsal a herî zêde ji bo azadiya girtî û windahiyan bû, her wiha gelek şehîdên me hebûn. Di pey wê re me pêwîstî dît ku rêxistinên jinan li hev kom bibin, ev yek jî di bin silogana “Werin em bi ev re têkoşîna xwe mezin bikin, ji bo misogerkirina mafê jinan de destûra Sûriyê de”. Rast e ev xebat bi Însiyatîfa Kongra Star hate meşandin lê beşdarbûna hemû delege û nûnerên jin yên di rêxistin û tevgerên di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de yên berê û heya niha bi hemû pêkhate û rengê xwe, hebûn. Dibe ku xebatên bi vê awayî berê jî hatibin kirin, lê me xwest em careke din bi şeklê konferans ku bi şeklekî em bikaribin rola jin di warên siyasî, civakî û bi taybet di warê entegrasyon û parastinê de, bidin nîqaşkirin. Di van çarçoveyan de ew nîqaş ji aliyê delegeyên jin ve hatin birêvebirin û xurtkirin ku em bikaribin ji nû de stratejiya xwe daynin, wê stratejiyên me di vê demê de çawa bin, em rastî xeteriyên çawa tên, her wiha em ê çawa di warê siyasî û leşkerî de destkeftiyên xwe biparêzin.”

**‘YPJ’ê ne weke hêzeke demkî hat avakirin, hêzeke ji bo parastina hemû jinan e’**

Ruken di dirêjahiya axaftina xwe de ev anî ziman: “Destkeftiyên ku niha me bi dest xistine di encama ked û têkoşîna bi salan hatine bidestxistin. Di nava hikumeta demkî ya Sûriyê de, ev mijarên jin û destkeftiyên me qet nayên nîqaşkirin, bi taybet rewşa YPJ’ê qet nayê ser ziman û xuyaya nehatiye qebûlkirin ji aliyê hikumetê ve. Ji bo wê di nîqaşên konferansê de YPJ’ê weke hêzeke parastinê ya jin ku em hemû dizanin rewşa YPJ’ê tê de hatiye avakirin de wê demê El Nûsra, DAIŞ û xeteriyên hikumetê hebûn, hate avakirin. Em dizanin jî hê xeteriya DAIŞ’ê di nava hemû Rojhilata Navîn de heye. Rewşa ku YPJ’ê tê de hatiye avakirin, ne weke hêzeke demkî bû, hêzeke ji bo parastina jin ji hemû kiryar û zihniyetên mêr ku avakirina wê ne tenê leşkerî ye, girêdayî rewşa îdeolojîk û hişmendiye ku hemû jin dikarin di hemû waran de xwe biparêzine. Ji bo wê di pêvajoya entegrebûnê de hê jî jin rastî xeteriyan û neqebûlkirinê tên. Heta me dît ku di rewşên dawiyê yên entegrasyonê de rasatî teşhîreke elketronîk tên da ku vîna wan bişkînin ku di cihên biryardariyê de cih negrin.

Ev rewş, rewş in gelekî zehmetin ku em tê de jiyan dikin û rastî pêvajoyeke dîrokî ye ku me ji 15 salan ve şerê hişmendî, guhertin û veguhertinê dikir. Lê em rastî itîrafê nehatin weke Rêvberiya Xweser, em niha ber ve hikumetê ve diçin, eger me di vir de ev destkeftî bidest nexistin, êdî em nikarin. Ev yek ne tenê di aliyê gelê Kurd de diçe, di aliyê mîrasa têkoşîna jin de diçe. Ji ber wê parastin divê, em her tim dibêjin parastina destkeftiyên jin parastina têkoşîna jin a cîhanî ye.”

**‘Biryarên demdirêj in û me stratejiya xwe diyar kir’**

Ruken di axaftina xwe de encamên ku di konferansê de hatine derketin nirxandin û wiha got: “Ji bo pêkanîna encamên di konferansê de hatine derketin, meş, kampaniya û çalakî jê re divên, her wiha hinek ji wan biryar in wê dem dirêj li ber xwe bide, lê weke stratejî hatine dayîn. Û hinek biryar hebûn wê êdî weke kampaniya dest pê bikin û hinek biryar hene jî wê bi tevlîbûna hinek aliyan di nava tevgerê de, werin pêk anîn ku em bikaribin zexteê bidin avakirin. Li ser wê esasî em dikarin bêjin me stratejiya xwe diyar kir, û di wê stratejiyê de em ê gavên di warê hiquqî, rêxistinî, dîplomasî û siyasî de biavêjin. Em Kongra Star rûniştin me di girtina van biryaran de çawa em ê bikin pratîk û di pratîkê de em ê têkoşîneke çawa bidin meşandin, nîqaş kir.”

**‘Bicihanîna biryaran ne tenê li ser Kongra Star e, têkoşîneke hevpar e’**

Her wiha Ruken bal kişan ser têkoşîna hev par a jinên Sûriyê ji bo parastina mafên xwe û wiha pê de çû: “Biryarên ku hatine standin tenê ne li ser pişta Kongra Star bin, ji ber me hemûyan bi hev re belge xwendin, nîqaş kirin û me ev biryar derxistin. Hin tişt hene têkoşîna wê ji me tê xwestin, û hin



tişt hene weke daxazên ku radestî civaka navnetewî bibin in. Ev wê daxwazên jinên herêmê bin, da ku zextek ji aliyê navnetewî de li ser hikumetê were kirin.

Li ser wê bingehê çend bendên wê hene; stratejiya dem kurt yên weke çalakî, û stratejiya dem dirêj yên weke cihgirtina jin di destûra Sûriyê de, parastina mafê jinan û kota jin wê di hikumetê de ne kêmtirî ji sedî 50’î be. Ev têkoşîneke ku tenê ji jinên herêmê nayê xwestin, Çima? Ji ber ev girêdayî rewşa hemû jinên di Sûriyê de ne. Yanî em bikaribin bi hev re bi têkoşîna jinên Sûriyê vî mafî biparêzin. Li gorî zagonên navnetewî divê kota jin ne kêmtirî ji sedî 30 be. Lê îro di hikumeta Sûriyê de ji bingeha 23 wezaratan, em tenî jinekê dibînin, her wiha di nava kursiyên parlamantoyê de yên ku ji 120 kursî pêk tê, tenê 4 kursî ya jine. Ev rewşekî xeternak e li ser hebûna jin di Sûriyê d, di destura hemdemî de ger jin cihê xwe tê de negrê, gelo wê çawa be? Ji bo wê niha xebatên ji nû ve sazkirinê heye, rewşa jinan piştî entegrasyonê, rêxistinên heyî çawa karibin xwe kom ser hev bikin, her wiha pêkanîna çalakiyên xwe û cihgirtina bi fermî di aliyên Sûriyê de.

**‘Stratejiyên xwe ji bo Sûriyeke nû dîsa ber çavan re derbas dikin’**

Ruken di domdariya axaftina xwe de bal kişand ser cihgirtina jin di nava hikumetê de û wiha domadn: “Bi taybet me berê tenê di cografiya xwe de kar dikir, lê niha em ê erêkirina xwe di Sûriyê de bistînin, wê tevgera me çêbibe da ku bi rihetî em di nava jinên Sûrî de kar bikin. Ji bo van û standina çend saziyan jinan ji ruxsetê re, kar tê meşandin. Bi taybet dibe ku di demên pêş de Rêveberiya Xweser nemîne lê xwesertiya herêmê parastî û weku xwe dimîne, ji bo wê da ku em bikaribin pişniyarên xwe di aliyê jin de bikin, jin îrade, hebûn û xwesertiya xwe di nava saziyên dewletê de biparêze.

Di aliyê hiqûqî de çend xebat hatine meşandin, ev kiryarên ku hatine kirin, werin belgerkirin û ji raya giştî re werin rêkirin ku bi rastî hesabxwestinek bê kirin. Di aliyê rêxistinbûyînê de ez dixwazim hin tiştan bêjim. Niha em weke saziyên rêxistinbûnên jin rewşa xwe ji nû ve digrin dest, kombûnên me çê dibin, di van kombûnan de em stratejiyên xwe ji bo Sûriyeke nû dîsa ber çavan re derbas dikin, her wiha di aliyê sîstem û parastina destkeftiyên manewî û madî di civakê de.”

**‘Cîhan deyndarê YPJ’ê ye’**

Rojeva herî girîng niha em amadekariya kampanyayeke girseyî dikin ku ji bo YPJ’ê were ragihandin. Me berê jî kampanyayên ji bo YPJ’ê dabûn destpêkirin, kampanyaya komkirina îmzeyan di bin navê “Em hemû YPJ’e ne, YPJ’e hêza me ya parastinê ye” li ser wê esasê rêxistinên jinan îmze komkirin ku daxwazên me ew e ku YPJ’ê weke hebûnekê di artêşa Sûriyê de misoger bibe. Bi rastî herêm bi xwe jî xwesertiya wê heye û hê xeteriyan hîs dikin. ne tenê YPJ’ê di ewlehî û asayîşa Sûriyê de hebê, lê weke hebûneke serbixwe were parastin. Di vê çarçoveyê de hemleyên me hatin destpêkirin, lê bi giştî di qada civakî, leşkerî û dîplomasî de wê kampanyayek cîhanî bê destpêkirin. Ji ber ku YPJ’ê ne artêşeke ku ji bo parastina jin û civaka herêmê şer kiriye, cîhan deyndarê wê ye di şerê ku li hember DAIŞ’ê de kiriye. Ji bo wê xwedîderketina li wê hêzê erkekî mirovî ye, wê demên pêş de bernameya vê xebatê were diyarkirin.”

Ruken Ehmed axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ji biryarên ku di konferansê de hatine derxistin wê ji bo çend mijaran komîte bên amadekirin. Jin bo cihgirtina jin di destûra Sûriyê de, ji bo qanûnên ku mafê jinê misoger bike. Pê ve girêdayî berê jî komîteyke me ya dayêna nêrînan di destura Sûriyê de hebû, wê dîsa eb komîte aktîv bibe. Wê ev komîte weke reşnivîsekê amade bike di derbarê jin di destura Sûriyê de mafekî çawa dixwazin. Wê ev yek ji herêmê dest pê bike û hemû parêzgehên Sûriyê bigre nav xwe, da ku em zextekê bi îradeya jinên Sûriyê li ser hikumetê çêbikin.”



# Li Efxanistanê ji ber lehî û erdhejê bi sedan kes mirin

Di hefteyên dawî de li Efxanistanê rêzekarîsetên xwezayî rû dan; di nav de lehiyên mezin, berfbarîna bêhempa û erdhejeke wêranker ku bi hev re bûn sedema ku bi dehan kesan jiyana xwe ji dest dan û birîndar bûn, di heman demê de zirarên madî yên berfireh çêbûn.

**Navenda Nûçeyan**

Efxanistan, ku bi çiyayên mezin dorpêçkirî ye, rastî gelek karîsetên xwezayî tê, di nav de erdhej ku ya herî zêde zirarê dighîne mirovan û dibe sedema zirarên madî. Salane ji ber karîsetên xwezayî û erdhejê nêzî 560 kes jiyana xwe ji dest didin û bi qasî 80 milyon dolarî zirarên madî çêdikin.

**Ziranên madî û mirovahî**

Di hefteyên dawî de barîna zêde ya berf û baranê, bûn sedema çêbûna lehehiyên mezin û berfireh li seranserî Efxanistanê. Li gorî Desteya Niştimanî ya Karîsetan, ev bûyer bû sedema hilwişandina nêzî 3 hezar û 500 malan.

Di encama van lehiyên dawî de ku li Efxanistanê çêbûne 77 kesan jiyana xwe ji dest dan û 137 jî birîndar bûne, ev hejmar li gorî daneyên ku hikumetê raghandin e hatiye piştrast kirin.

Berdevkê hikûmeta Efxanistanê Zebîhullah Mucahîd berê jî diyar kiribû ku lehiyan zirar gihandiye wêranbûna tevahî an qismî ya 2 hezar û 448 malan herwiha 26 hezar û 841 donim (nêzîkî 5 hezar û 370 hektar) zeviyên çandiniyê û mirina hezar û 45 serî ajal.

Li wîlayeta Zabilê, li gorî hin raporan berfeke ji nişka ve di buharê de bariya ye, ku bû sedema girtina rêyan



û zirar gihandiye zeviyên çandiniyê. Hate nasîn ku kûrahiya berfê gihaşt nêzîkî 75 santîmetreyan, ku ji bo vê demsalê asteke bêhempa ye.

Di heman demê de li wîlayetên Xeznî û Werdekê berf di dema kulîlkvedana daran û mezinbûna berheman de bariya, wekî din barîneke balkêş li deverên çiyayî, di nav de herêma Salang jî hatiye.

**Hewildanên sivikirina kirîzê**

Ji aliyê xwe ve, Wezareta Veguhestinê ya Efxanistanê ragihand ku ew hewl dide da ku berfê rake û rêyan veke, lê hin rêyên sereke heta roja Înê di dîroka 3’ê Nîsanê de girtî man, di nav wan de rêya Kabûl-Celal Ebad, rêya Dara Suf-Belex û rêya Salang. Berdevkê Wezaretê Mihemed Eşref Heqşenas got ku girtina rêya Kabûl-Celal Ebadê li herêma Dogan Tangî ji ber şemitîna heriyê û ketina keviran a ji ber barana zêde, pêk hatiye.

Hikûmetê ragihand ku xebatên rizgarkirinê ji bo kesên ku di bin lehiyê de asê mane didomin, herwiha diyar kir ku wan karîbû du kesên li Zabilê asê mabûn xilas bikin. Rayedaran ji welatiyan xwestin ku çûn û hatina xwe sivik bikin û hişyarî dan li ser şert û mercên xeternak li hin deveran.

**Nîşaneyên avhewayê**

Efxanistan yek ji wan welatan e ku ji guherînên avhewayê yên herêmî bandor bûye, di demekê de ku pêla baran û berfê ya niha bi daneyên NY re hevdem e û nîşan didin ku zivistana welêt di dawiya Çileya borî de zivistana herî hişk û hişkesalî a 25 salên dawî bû. Bi kêmbûneke balkêş a barîna berfê di sala 2025-2026’an de.

Pisporên di warê avhewayê de dibînin ku barîna berfê di biharê de, nemaze li dewletên ku bi awayekî rêjeyî germ e, diyardeyek bê hempa ye ku bi guherînên ji nişka ve yên avhewayê ve girêdayî ye û dibe sedema fikarên gerdûnî.

**Erdhej krîzê aloztir dike**

Li gorî Peymangeha Lêkolînên Jeolojîk a DYA’yê (USGS), erdhejeke bi şîddeta 5.8 pileyî li bakurê rojhilatê welêt, ku navenda wê nêzîkî wîlayeta Bedexşan bû, bi kûrahiya 186.4 kîlometreyan di 3’ê Nîsanê de çêbû.

Cîgerê berdevkê hikûmetê Hamdallah Fitret eşkere kir ku li gorî agahiyên destpêkê ji ber erdhejê 12 kesan jiyana xwe ji dest dan û çar kes jî birîndar bûn.

Peymangehê destnîşan kir ku navenda erdhejê 35 kîlometre ji başûrê Cermê li wîlayeta Bedexşan ye, lê belê erdhej li gelek deverên din yên Efxanistanê, tevî paytextê Kabûlê, hatiye hîskirin.

Berdevkê Wezareta Tenduristiyê ya Efxanistanê Şerefat Zeman, di daxuyaniyekê de ji bo çapemeniyê got, “Li navçeya Kosfendrî ya Kabûlê, heşt kesan ji malbatekê di erdhejê de jiyana xwe ji dest dan. Tenê zarokek ku temenê wî nêzîkî du salan e sax maye. Desteya Rêveberiya Karîsetên Neteweyî piştrast kir ku ew zarok birîndar bûye.

Li Efxanistanê gelek caran erdhej çêdibin, bi taybetî li rêzeçiyayên Hindukuş, nêzîkî xala ku sefîheyên tektonîk ên Orasiya û Hindistanê dighêjin hev.

Li gorî rayedaran, di Tebaxa 2025’an de erdhejeke bi şîdeta 6 pileyî li Kinar, Laxman û Nengerharê çêbû û di encamê de zêdetirî 2 hezar û 200 kes mirin û nêzîkî 4 hezar kes birîndar bûn. Herwiha di Mijdara 2025’an de, li bakurê welêt erdhejeke bi şîdeta 6.3 pileyî çêbû û herî kêm 27 kes mirin.

Li gorî texmînên Neteweyên Yekbûyî, di Cotmeha 2023’an de, erdhejeke bi hêza 6.3 pileyî çêbû û li pişt wê rêzehejên bihêz li wîlayeta Heratê ya li rojavayê Efxanistanê çêbû, di encamê de zêdetirî hezar û 500 kesan jiyan xwe ji dest dan û zirar gihaşt zêdetirî 63 hezar malan. Ev erdhej a herî bihêz bû ku di Efxanistanê de ji zêdetirî 25 salan çêbû û nêzîkî 300 dibistan û navendên perwerdehiyê hatin hilwişandin.

Piştî vegera Talîbanê li ser desthilatê di sala 2021’an de, alîkariya navneteweyî ji bo Efxanistanê bi awayekî berbiçav kêm bû, ku ev yek jî kapasîteya welat a ku jixwe sînordar e ji bo rûbirûbûna karîsetan, zêdetir lawaz kir.

# Li Îranê binesaziyên perwerdê û çandî tên hedefgirtin

**Navenda Nûçeyan**

**Wezîrê perwrdeyê yê Îranê Hisên Smaî diyar kir ku ji destpêka şerê li Îranê bi kêmanî 30 zanîngeh hatin hedefgirtin. Di nava êrişan de jî gelek cihên çandî û arkolojîk hatin bombebarankirin.**

Ev zêdeyî mehekê li ser şerê li Îranê ku ji hêla Amerîkayê-Îsraîlê ve hatiye destpêkirin, derbas bûye. Dema ku êriş dest pê kir, di serî de binesaziya mûşekan û çekên giran yên Îranê hatin hedefgirtin. Armanca Amerîkayê-Îsraîl ya sereke ew bû ku hêza Îranê ya leşkerî û nûkleerî bişkîne, li gorî daxuyaniyên serokê Amerîkayê Dunlad Trump jî, heta astekê ev armanc pêk hat. Di heman demê rêveberiyên payebilind yên ku Îran bi rêve dibirin jî, hatin kuştin.

**Pernesîbên exlaqî yên şer û pevçûnan**

Bi bilindbûna asta êriş û hedefgirtinên li dijî Îranê, êrişên Amerîkayê û Îsraîlê gihaşt ku saziyên binesaziya sivîlan bi taybet yên perwerde û lêloklînan jî hedef bigre. Ev yek jî xeteriyeke mezin bi xwe re tîne ku berê vî şerê ber bi karîseteke mirovahî ya bê hempa dibe. Yek ji pernesîbên bingehîn yên şer û pevçûnan, ew e ku nabe binesaziyên sivîl û hedefgirtina sivîlan di dema rûbirûna leşkerî de, bê kirin. Lewma hilweşîn û bombebarankirina bêserûber a binesaziyên cuda wekî binpêkirinek ji qanûnên pêvçûnên çekdarî û qanûna navdewletî yên mirovahî ye, ji ber ev yek karîseteke mezin û rasterast li ser niştecihan dike.

**30 zanîngeh hatin bombebarankirin**

Weîzrê zanistê yê Îranê Hisên Smaî Saraf eşkere kir ku ji dema êrişên Amerîkayê-Îsraîlê li ser Îranê ku di dawiya Sibatê de destpê kir, zêdetirî 30 zanîngeh bi awayekî rasterast, hatine bombebaran kirin. Di heman demê de televîzyona fermî ya Îranê diyar kir ku DYA û Îsraîlê êrişek li ser zanîngeha Şehîd Behşetî li bakurê Tehranê pêk anîn dema şopandin tê de dihat kirin, di encamê de zirarên mezin gihaşt binesaziya wê.

**Hedefgirtina nêzî 160 xalên zanîngehê**

Ji aliyên xwe ve Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ya Zanist û Çandî ya UNESCO’yê li Îranê, xemgîniya xwe ji ber bombebarana zanîngeha Şehîd Beheştî anî ziman û destnîşan kir ku zanîngeh û fakulte herwiha mîrata çandî bêparastin mane.

Di heman demê de Sekretêrê Giştî yê Komîteya Niştimanî ya UNESCO’yê li Îranê Hesen Fertûsî wiha gotiye: “Nêzî 160 xal li zanîngehên Îranê hatin bombebaran kirin û hin fakulte bi temamî hatin hiliwşandin.”

Hesen Fertûsî ji televîzyona El-Erebî piştrast kir ku heta bi binesaziyên zanistî, perwerde û çandî li Îranê tên hedefgirtin di nav de jî mexberên ku dermanên bijişkî çêdikin.

**Hedefgirtina cihên çandî li Îranê**

Li gorî Hesen Fertûsî, raporên fermî nîşan didin ku zêdetirî 132 deverên arkeolojîk li Îranê hatine hedefgirtin, ku hin ji wan wekî deverên Mîrateya Çandî ya Cîhanê hatine tomar kirin, ku ev tê wateya hedefgirtina şaristaniya mirovahiyê, çand û dîroka Îslamî, Erebî û mirovahiyê ya li vê herêmê. Sekreterê Giştî yê Komîteya Neteweyî ya UNESCO’yê li Îranê diyar kir ku “Qesra Golstanê” ku 220 sal berê hatiye avakirin, bû hedefa êrişan.

Li gorî Hesen Fartûsî, cihên ku dîroka wan vedigere serdema “Teymûrî”, ku temenê wê 600 salî ne li Esfehanê jî bûn hedef û zêdetirî 23 avahiyên çandî zirar dîtin.

Di dawê de Hesen Fertûsî destnîşan kir ku avahiya mîrateya çandî ya nêzîkî keleha “Felek el-Eflak” li Lorîstanê, êrîşên din li Kirmaşanê, li kompleksa geştiyariyê ya li Ehwazê li başûrê Îranê û li bendera “Sîraf” li Bûşehrê hatin hedefgirtin.



# Ji Navdêrên jinên Kurd; Mîna Qazî Xanim

**Zana Roj**

Mîna Qazî Xanim (1908-1996)
Mîna Xanim, di sala 1908'an de, li malbateke welatparêz ji dayik bûye. Mîna Xanim, di sala 1928'an de, dema ku hê 19 salî ye bi Qazi Mihemed re dizewice. Ji vê zewacê 7 keç û kurek, 8 zarokên wan çêdibin. Hê ku nezewiciye wek Mîna Îskenderî tê nasîn. Piştre, wek Mîna Qazî û li gel avabûna komarê jî wek Dayê Xanim tê binavkirin. Malbata Mîna Xanimê wek malbatên din keçikên xwe nedişandin dibistanê. Ji ber vê, xwendin û nivîsîna wê tune bû. Lê belê, Mîna Xanim piştî Komara Mehabadê ava bû wek berpirsyariyek dît ku hînî xwendin û nivîsînê jî bibe. Herwiha di vê mijarê de ji jinên din re jî dibe mînak û ji wan re pêşengîyê dike. Mîna Xanim ji alîyê zimên de jî pêşketî bû û li gel zaravayê Soranî ya Kurdî, Ezerîkî û Farisî jî dizanî. Wê wek jineke Kurd, di qonaxeke girîng a dîrokî de, bi biryardarî û wêrektîyeke mezin bar û berpirsyarîya Komarê jî hildabû ser milê xwe. Mîna Qazî peywira xwe ya wê serdemê û hestên xwe yên wê rojê jî tîne zimên û axaftina xwe wiha didomîne; "Ez wê demê seroka Yekîtîya Jinên Kurd bûm. Jinên ku ji Mehabad û ji herêmên Kurdistanê yên din hatibûn jî li Çarçirayê kom bûbûn. Mîna Xanim, piştî avabûna Komara Mehabadê, ji bo pêşketin û mezinbûna Komarê jî gelek hewl û ked daye. Ew di ferqa pêvajoya dîrokî ya ku tê de dijîn de bû û di wê zanebûnê de bû ku hewcedarîya gelê Kurd bi xwerêvebirineke azad heye. Bi vê bawerî û daxwazê, li gel 8 zarokên xwe, heta dawiya temenê xwe her tim di nava têkoşîne de bû. Mîna Xanim diyar dike ku, piştî avabûna Komara Mehabadê daxwaz û hêza wê ya tevlîbûna xebatan zêde bûye. Ew vê rewşê bi van gotinan bi lêv dike: "Ji ber ku xwendin û nivîsandina min tunebû ez pir bi xwe ne bawer bûm ku tevlî xebatan bibim û pêşengiyê bikim. Lê belê, coş û kelecana avabûna Komarê û fikra Kurdîstana azad hêz û cesaret dida min. Herwiha Qazî Mihemed jî her tim bi gotinên xwe hêz dida min û cesareta min xurttir dikir. Ez bi vê bawerî û kelecana wî serbilind bûm. Lewre, em li ser hemû mijaran bi hev dişêwirîn. Ew jî di hemû biryar û kirinên xwe de her tim bi min re diaxivî û qedr û qiymet dida fikrên min. Di têkîlîya me de rêhevaltî her tim li pêş bû." Mîna Xanimê, ji bo ku ji jinan re bibe mînak, pêşiyê bi xwe xwendin û nivîsîn hîn bûye, paşî jin jî di vê mijarê de teşwîq kirine û cesaret daye wan. Di heman demê de ji bo ku pirsgirêkên mirovên feqîr û hejar çareser bike, ketiye nava hewldaneke taybet û kedeke mezin daye. Mîna Qazî, bi bîr, bawerî, xîret, biryardarî û vîndarîya xwe ya berxwedanê, bi nêzîkatî û sekna xwe jî di têkoşîna jinan de cihekî girîng digire. Ew ji bo xebat û têkoşîna xwe bi awayekî hê rêxistinkirî bimeşîne, di 14'ê Adara 1946'an de 'Yekîtî Afretanî Kurdîstan', anku 'Yekîtiya Jinên Kurdistanê' ava dike. Vê rêxistina jinan, li Mehabadê, piştî civîneke ku li mala xwe li dar xistîye hatibû îlankirin. Mîna Xanim di vê civînê de wek serok hatiye hilbijartin û di civînê de ji bo jinan û ji bo mezinbûna Komara Mehabadê hin biryar jî hatibûn girtin. Li gor vê:

- •Jinên Kurd ji bo xwendin û nivîsînê dê bên teşwîqkirin.
- •Xebatên çapemenîyê dê bên meşandin.
- •Ji bo Komara Kurd a Mehabadê dê barbû, anku aîdat bên berhevkirin.
- •Her wiha wê xwedî li malbatên ku ji zilma rejîma Iraqê revîyane û hatine Mehabadê derkevin.

Rêxistina Yekîtiyê, li gel van biryaran hem ji bo perwerdehî û pêşketina jinan, hem jî ji bo ku wan tevlî jiyana civakî û siyasî bike xebat meşandîye. Di heman demê de, di dibistanên ku li Mehabadê hatibûn vekirin, ji zarokên keç re perwerdehîya Kurdî hatîye dayîn. Di wê serdemê de wek gelek deverên cîhanê, li Îran û Kurdistanê jî bi gelemperî rewşa ku jin tê de bûn mixabin ne baş bû. Lewre jin xwedî biryarên jiyana xwe nebûn. Çarenûsa wan bi tevahî li gor biryarên mêrên malê û li gor hişmendî û pergala baviksalarî teşe digirt. Mîna Xanim, ji bo vê rewşa jinê gelek xemgîn dibû. Ji bo ku li Mehabadê ev rewşa dilşewat biguherîne gelek hewl dida, diket nava lêgerîn û riyên çareserîyê. Ji ber wê, her tim guh dida pirsgirêkên jinan, ji bo çareserîyê hêz û piştgirî dida wan. Yekîtîya Jinên Kurdîstanê, di dema xwe de ji bo jinan destpêkek bû. Jinên Rojhilat, cara yekem bû rêxistinbûyîn û yekîtiya xwe pêk dianîn. Di encama van xebatan de, gelek jin di warê civakî û siyasî de tevlî xebatan dibûn, heta ji bo ku bibin pêşmerge hevjînên xwe teşwîq dikirin, ew bi cesaret dikirin. Vê sekna jinan, bandoreke erênî li ser mêran jî dikir ku tevlî pêşmergeyan bibin. Jinan jî li bin



sîwana vê yekîtiyê pirsgirêkên xwe nîqaş dikirin, rê û rêbazên nû yên çareserîyê bi pêş dixistin; dibûn xwedî vîn, xwedî biryar û hêzeke mezin. Mîna Xanim her tim behsa têkiliyên xwe yên bi jinan re jî dike û dibêje ku di navbera wan û jinan de têkilîyeke gelek germ û pêşketî hebûye. Mijarên wek perwerdekirina zarokan, hînbûna xwendin û nivîsînê ya jinan, xwarin û cil û bergên pêşmergeyan her tim dihat nîqaşkirin. Ew, di xebatên rêxistinkirin û propagandayê de gelek bi serketî bû. Mîna Qazî, piştî hilweşîna Komarê jî, bi awayekî veşartî be jî, wisa kiribû ku rêxistina Yekîtiya Jinan xebatên xwe demek dirêj bidomîne. Mîna Xanim gelek dixwest ku jin di her qadê de, bi awayekî pêşeng û çalak tevlî têkoşînê bibin. Piştî salên dirêj di hevpeyvînek xwe ya ku di sala 1994'an de dabû nivîskar Kakşar Oremar behsa vê mijarê dike û daxwaza dilê xwe dide der: "Min pir dixwest ku jinên Rojhilat jî tevlî pêşmerge bûbûna û mêr û jin bi hev re ji bo azadîya xwe şer bikirana. Dema min cara ewil jinên pêşmerge ya wek Margarît bihîst, ez pir kêfxweş û bi hestyar bûm. Xwezî ew derfetên me jî hebûna. Niha jî li Bakurê Kurdîstanê jin û mêr bi hev re di hemû qadan de têdikoşin. Ev hêvîyek pir mezin dide min. Ez bextewar im ku êdî şopînerên doza me hene. Kurd êdî şîyar bûne û daxwaza azadiya xwe dikin."

Mîna Xanim, di 17'ê Berfanbara 1946'an de, dema ku Mehabad ji aliyê leşkerên Îranê ve hatiye dagirkirin û piştî hingê jî li gel hemû êrîşên rejîma Îranê ji Mehabadê derneketîye. Dema ku Qazî Mihemed 3 mehan di zindanê de bû, ew tu carî tenê nehişt û têkoşîna xwe domand. Wê ji bo ku Qazi Mihemed ji darvekirinê xelas bike gelek hewl da; lêbelê, derdora wê ya nêzîk jî tê de, ji tu kesan piştgirîya ku dixwest nedît. Bayekî mezin ê tirsê hatibû rakirin û tu kesan nediwêrî xwe nêzî malbata Qazî bikin. Tevî hemû hewldanên xwe, nikaribû Qazî Mihemed ji darvekirinê rizgar bike û yekîtiya Kurdan ku xeyala wê û yê Qazî Mihemed bû pêk bîne. Dîsa jî, bawerî û hêviya Mîna Xanimê her tim zindî maye.

Tenê daxwazek wê hebû û digot: "Bila Kurd yekîtiya xwe pêk bînin." Piştî dagirkirina bajarê Mehabadê û 31'ê Adara 1947'an a şehîdkirina Serokomar Mihemed Qazî û pêşengên komarê, Mîna Xanim jî salên dirêj ji ber têkoşîna xwe gelek caran ji aliyê pergala Îranê ve hatîye binçavkirin û rastî îşkenceyan hatîye.

Di sala 1984'an de, ew 11 mehan ji hêla rejîma Îranê ve hatiye girtin û rastî îşkence û şîdetê hatiye. Dema ku di girtîgehê de bû, Mîna Xanum ji ber îşkence û êşê nexweş ket. Ji bo ku wê bişînin nexweşxaneyek asayî, rejîmê xwest ku yek ji keçên wê li şûna wê were girtin. Ji ber vê yekê Xanim Fewziye çû girtîgehê û Mîna Xanum jî şandin nexweşxaneyek li Tehranê. Ew bi alîkariya Kurdên ku li bajêr dijîn ji nexweşxaneyek li Tehranê hate rizgarkirin û li Meşhedê xwe veşart. Di sala 1991'an de, ew çû Almanya lê paşê vegeriya Mehabadê. Di salên 1995 û 1996'an de ji bo dermankirina nexweşiya wî çû derveyî welêt û piştî ku hêviya xwe ji başbûna xwe winda kir, ew vegeriya Mehabadê û di dawiyê de di 17.02.1996'an de koça dawî kir.



Gulîstan Xalid

## Gelo Aştî yan Şer?

Birîna sedsalî ya prsgirêka Kurd li Rojhilata Navîn, di her serdemeke nû de an bi çirûskek hêviyê an jî bi tarîtiyek hîn kûrtir derdikeve holê. Herî dawî banga Rêber Abdullah Ocalan a ji bo "aştî û civaka demokratîk" careke din deriyek hêviyê di vê çerxa dîrokî de vekir. Ev bang ji bo bêdengkirina çekan, nîqaşkirina siyasetê û avakirina pêşerojek hevpar ji bo gelan li ser bingehek demokratîk hate kirin. Lêbelê, berevajî bendewariyan, gavên ku Tirkiyeyê di bersiva vê bangê de heya niha avêtine ber bi aştiyê ve zêdetir, ber bi hişkbûn û aloziyê ve teşe girtiye.
Bangên aştiyê, li gorî xwezaya xwe dema ku bersiv dibîne bi wate dibe. Daxuyaniyên yekalî yên niyeta baş, heke bi gavên berbiçav ji aliyê din ve neyên piştgirîkirin, bi demê re bandora xwe winda dike û rê li ber nebaweriyê vedike. Kiryarên leşkerî û siyasî yên dawî yên Dewleta Tirk, di vê wateyê de, pirsa "aştî an şer?" hîn tûjtir kirine. Ji ber di demeke ku ji aliyê piştgirên banga Rêber Abdullah Ocalan ve hewl tê dayîn diyalog û zimanekî çareseriyê were danîn, li aliyê din operasyon, binçavkirin, zext û polîtîkayên hişk berdewam dikin.
Ev rewşa nakok ne tenê di navbera aktorên siyasî de, lê di heman demê de di navbera beşên berfireh ên civakê de jî tevliheviyê diafirîne. Gel, bi taybetî gelê Kurd ku bi salan e bedelê pevçûnê daye, niha zelaliyê dixwazin: Gelo çareseriyek rastîn tê armanckirin, an pêvajo tenê taktîkek mijûlkirinê yê derengxistinê ye?
Baş tê zanîn ku Tirkiye her tim polîtîkayên ewlehiyê ji bo xwe daye pêşiyê. Lêbelê, eşkere ye ku ev rêbaz di şert û mercên heyî de ne domdar e. Di serdemek ku hevsengiya hêzê li Rojhilata Navîn bi lez diguhere û civak daxwaza bêtir gotin û mafan dikin, bi rêbazên kevin ne mimkûn e ku encamên nû werin bidestxistin. Demokratîkbûn ne tenê hilbijartinek e, di heman demê de pêdivîyek e jî.
Banga Rêber Apo wekî bîrxistina vê pêwîstiyê ye jî. Ew ne tenê daxwazek ji bo agirbest an rawestandina pevçûna ye; ew di heman demê de perspektîfek li ser pêkanîbûna peymanek civakî ya nû, hemwelatîbûna wekhev û jiyana hevbeş pêşkêş dike. Lêbelê, ji bo ku ev perspektîf pêk were, divê baweriya hevbeş were avakirin. Û bawerî tenê bi hevgirtina gotin û siyasetê ve dikare were bidestxistin.
Îro, Tirkiye bi du rêyan re rû bi rû ye: an dê bangên aştiyê bi ciddî bigire û gavên wêrek ber bi veguherîna demokratîk ve bavêje, an jî dê bi polîtîkayên heyî berdewam bike û çerxa pevçûnê kûrtir bike. Rêya yekem dijware lê çareseriyek mayînde pêşkêş dike, lê ya duyemîn, her çend dibe ku kontrola demkurt peyda bike jî, di demek dirêj de dê deriyê krîzên hîn mezintir veke.
Di encamê de, her gavek ku îro tê avêtin dîroka sibê dinivîse. Ger ev dîrok bi aştîyê were bîranîn ne bi şer, divê valahiya di navbera gotinan û kiryarê de were girtin. Wekî din, bangên ji bo aştiyê dê mehkûmî wê yekê bin ku tenê wekî notên niyeta baş di rûpelên dîrokê de bimînin.



# Bermahiyên şer xeteriya li ser jiyana sivîlên Sûriyê zêde dike

Tevî ku şer heta astekê bilind li Sûriyê rawestiyaye, lê mirin bi dawî nebûye. Li deverên Sûriyê bermahiyên şer û mayinên neteqiyayî xeteriyeke mezin li ser jiyana sivîlan çêdike. Ji destpêka hilweşîna rêjîma Baas ve û heta niha di encama teqîna bermahiyê şer de bi sedan sivîl jiyana xwe ji dest dane.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Agahiyên belgekirî nîşan didin ku ji ber bermahiyên şer li Sûriyeyê ji dema hilweşîna Rêjîmê heta roja îro windahiyên mirovî yên berdewam çêbûne, ji ber ku hejmara sivîlên ku di encama teqîna mayîna û teqemeniyên neteqiyayî de jiyana xwe ji dest dane gihîştiye 899 sivîlan, di nav wan de 237 zarok û zêdetirî 54 jin hene.

Ji dema hilweşîna Rêjîmê ve, li Sûriyeyê bûyerên mayîn û teqemeniyên şer bi awayekî eşkere berdewam bûn, ku ev yek jî gefê li jiyana sivîlan dike, tevî salên ku di dawiya şer û pevçûnan de li gelek deveran derbas bûne. Daneyên belgekirî nîşan dan ku sivîl, di nav de zarok jî, di dema çalakiyên xwe yên rojane yên wekî şivanî, xebat û lîstinê de jiyana wan kete xeteriyê. Hejmara sivîlên ku jiyana xwe ji det dane ji ber bermahiyên şer, xeteriya ku li ser niştecihên li deverên Sûriyeyê eşkere dike, di nav de deverên ku di bin kontrola Hikûmeta Şamê a demekî de ne û deverên din. Herwiha ew piştrast dike ku bi lezgîn ev teqemenî û mayînîn şer




werin rahiştin, di heman demê de bernameyên hişyariya xeteriya wan xurttir bikin û misogerkirina parastina sivîlan bi taybetî zarok.

**Hûrgiliyên ji dema hilweşîna Rêjîmê ji 8'ê Kanûna 2024 heta meha Adara 2026"an ve**

Ji roja hilweşîma Rêjîmê heta dawiya sala 2024"an ve:
Hejmara sivîlên ku jiyana xwe ji dest dane ji dema hilweşîna rêjîmê di 8'ê Berfanbar, heta dawiya sala 2024"an ve, di encama teqîna teqemenî û mayînên neteqiyayî di şerê Sûriyeyê de 80 kes in di nav wan de 12 zarok û 6 jin in.


Û ji destpêka sala 2025"an ve 599 kes jiyana xwe ji dest dane di encama teqîna bermahiyên şer, di nav wan de 192 zarok û 41 jin bûn, ew li sernserî deverên di bin kontrola Hikûmeta Şamê û Rêveberiya xweser ve balvkirî ne.
Hûrgiliyên mehane li gorî çavdêriya Sûriyê ji destpêka sala 2025"an ve:
Çile: Hejmara sivîlên ku jiyana xwe ji dest dane di encama teqîna bermahiyên şer 118 kes in di nav wan de 18 zarok in û 10 jin in.
Sibat: Hejmara sivîlên jiyana xwe ji dest dane di vê mehê de 94 kes in di nav wan de 19 zarok û 3 jin in.
Adar: Hejmara sivîlên jiyana xwe ji dest dane hi meha Adarê de 110 kes in di nav wan de 26 zarok û 9 jin in.
Nîsan: Hejmara sivîlên jiyana xwe ji dest dane di vê mehê de 55 kes di nav wan de 18 zarok û 7 jin in.
Gulan: Hejmara sivîlên jiyana xwe ji dest dane di vê mehê de 52 kes in di nav wan de 23 zarok û 2 jin in.
Hizêran: Hejmara sivîlên jiyana xwe ji dest dane di vê mehê de 35 kes in ji wan 16 zarok û 2 jin in.
Tîrmeh: Hejmara sivîlên jiyana xwe ji dsest dane di vê mehê de 25 kes in di nav wan de 11 zarok û 3 jin in.
Tebax: Hejmara sivîlên jiyana xwe ji dest dane di vê mehê de 32 kes in di nav wan de 16 zarok û 4 jin in.
Îlon: Hejmara sivîlên jiyana xwe ji dest dane di vê mehê de 23 kes in di nav wan de 12 zarok in.
Cotmeh: Hejmara sivîlên jiyana ji dest dane di vê mehê de 15 kes in di nav wan de 5 zarok in.
Mijdar: Hejmar sivîlên jiyana ji dest dane di vê mehê de 24 kes in di nav wan de 18 zarok in.
Berfanber: Hejmara sivîlên jiyana xwe ji dest dane di vê mehê de 16 kes in di nav wan de 10 zarok û jin in.
Li gorî çavdêriya Sûriyê ji destpêka sala 2026"an ve û heta roja îro, hejmara kesên ku ji ber teqîna bermahiyên şer ên Sûriyê 219 kes in di nav wan de 33 zarok in.
Hûrgiliyên mehane:
Çile: Li gorî çavdêriya Sûriyê 20 kes jiyana xwe ji dest dane di nav wan de 7 zarok û jinek e.
Sibat: Di vê mehê de 67 kes jiyana xwe ji dest dane di encama teqîna bermahiyên şer di nav wan de 17 zarok û 6 jin in.
Adar: Di vê mehê de hejmara kesên jiyana xwe ji dest dane 34 kes in di nav wan de 9 zarok û 97 birîndar in ji wan 28 zarok û jin in.
Ev hejmar pêwîstiya lezgîn a pêkanîna bernameyên paqijkirina mayîn û teqemeniyên bermahiyên şer (ERW), xurtkirina tedbîrên pêşîlêgirtinê ji bo parastina sivîlan û xurtkirina hişmendiya civakê li ser xetereyên van materyalan destnîşan dike. Her wiha girîngiya belgekirina binpêkirin û zirara ku ji ber ERW çêdibe ji bo misogerkirina parastina mafên sivîlan û pêşxistina planên vejandina berfireh ji bo deverên bandordar tekez dike.

# DYA'yê plana Îsraîlê ya li dijî Hizbullahê rawestand

**Navenda Nûçeyan**

**Çavkaniyên Îsraîlî diyar kirin ku DYA'yê bi awayekî rasterast destwerdan kir, êrişa Îsraîlê li dijî deriyê El Mesne yê di navbera Sûriyê û Lubnanê de rawestand û plana Îsraîlê ya kişandina Sûriyê li nava şerê li dijî Hizbulllaha Lubnanê asteng kir. Li hêleke din wezîrê Parastinê yê Amerîkayê Pete Hegseth gef li Îranê xwar ku wê Îran rûbirûyî hejmara herî mezin a êrişên leşkerî be.**

Çavkaniyên siyasî yên Îsraîlî diyar kir ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) êrişa Îsraîlê li dijî deriyê El Mesne yê di navbera Sûriye û Lubnanê de asteng kir, plana kişandina Sûriyê nava şerê li dijî Hizbullahê rawestand.
Radyoya Îsraîlê destnîşan kir ku piştî demeke kurt ji daxuyaniya berdevkê artêşa Îsraîlê ya bi zimanê Erebî ku dibêje beriya êrişkirinê deriyê sînor vala bikin, Rêveberiya Amerîkayê ji serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanyahu daxwaz kir ku vê êrişê bisekinîne.
Artêşa Îsraîlê bi hinceta Hizbullah derî û rêya lez a M30 ya li derdorê ji bo armancên leşkerî bi kar tîne êrişên deverên li nêzî deriyê kiribû û got ew amadekariya êrişî derî dike û ji kesên li wir xwest ku wir vala bikin.
Raporekê bi bîr xist ku Îsraîlê daxwaz ji DYA'yê xwestiye ku ji ber sedemên siyasî êrişa li dijî derî taloq bike û mijarê ji rayedarên ewlehiyê yên Sûrî yên ji ber serok Ehmed El Şeri ve dixebitin re bihêle.
Radyoya Îsraîlê ku agahiyên xwe dispêre çavkaniyekî da zanîn ku têkildarî mijarê hikumeta demkî ya Sûriyê ji Amerîkayiyan re gotiye ew li dijî Hizbullahê dixebitin û wan di rojên borî de hewlên qaçaxîkirina çekan ji Sûriyê ber bi Lubnanê ve têkbirine.
Lê hin çavkaniyên dîtir anî ziman ku armanca rast ew e ku zext li Şamê were kirin ku bikeve nava şer. Ev jî dişibihe ew tecrûbeya ku Îsraîlê di 1976'an de rê daye 20 hezar leşkerên artêşa Sûriyê ku derbasî Lubnanê bibe, bi wê re trajediyeke biêş ji Lubnaniyan re çêkir.
Li gorî çavkaniyên ji rojnameya Îsraîlî Maariv re gotine, Îsraîl diyar dike ku têkçûna berdewam a Lubnanê di rûbirûbûna Hizbullahê de, windakirina baweriya Amerîka û Rojavayî bi saziyên dewleta Lubnanê, têrê dikin ku rewşeke herêmî ya nû were avakirin, Îsraîl û rejîma Sûriyê ya nû ji bo parvekirina berpirsiyariyên ewlehiyê li Lubnanê lihev bikin.




Di çarçoveya êrişên ku li herêma rûdidin de, tekez e ku êrişên li ser Hizbullahê bi şerê DAY-Israîlê li ser Îranê ve girêdayî ye, rawestandina plana Israîl ji bo Hizbullahê armanc jê ew e ku hêzekeke mezin a êrişan a Israîlî, Îranê bike armanc.
Ji ber vê yekê jî wezîrê Parastinê yê Amerîkayê Pete Hegseth di heman roja danîna vê planê de ango 6'ê Nîsanê de, gef li Îranê xwar ku îro wê Îran rûbirûyî hejmara herî mezin a êrişên leşkerî be.
Hegseth got, "Îro (duşem), wê li dijî Îranê ji roja yekemîn zêdetir hejmara êrişan mezintir be" û wê sibe hîna zêdetir be.

# ‘Şerê Rojhilata Navîn, şerê diyarkirina hêza hegemon a nû ye’

Berdevkê Dîplomasiya PJAK’ê li Ewropa Zagros Enderyarî diyar kir ku şerê Rojhilata Navîn, şerê diyarkirina hêza hegemon a nû ye, herwiha şerê Rojhilatê Kurdistanê, şerekî du alî ye ku di navbera Îsraîl-Amerîka wek hêza hegemon û Îran wek hêzekî herêmî de tê meşandin, bi sedema vî şerî jî rewş pir zehmet bûye. Em jî hêvî dikin ev bibe derfetek ku Rojhilatê Kurdistanê ber bi demokarsiyê ve here.

**Ronahî Sadûn**

Derbarê Şerê Rojhilatê Kurdistanê û Îranê de, bi taybet her sê xetên şer ku di vî şerî de derketin holê, Berdevkê Dîplomasiya PJAK li Ewropa Zagros Enderyarî bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Di 27’ê Adarê de Şandeya DEM Partî bi Rêber Apo re hevdîtinek pêk anî, Rêber Apo di wê hevdîtinê de bal kişand ser Rojhilata Navîn û got ku planek hegemonîk li ser Rojhilata Navîn tê meşandin, hûn vê çawa dinirxînin?**

Sefaret bi pirsa yekê û axaftina Rêber Apo, rast e em jî wisa dihizirin: Niha şerekî mezin li Rojhilata Navîn birêve diçe. Ev şer berê jî hebû, lê li cihên din û bi awayên cuda hate kirin; mînakî li Xezayê û Lubnanê, piştre ket Sûriyê, hinekî jî ket Iraqê ser Heşd El-Şaabî, herî dawî ku niha li Îranê bi awayekî pir berfireh û kûr dimeşe. Şerê Îran û Îsraîlê şerekî hegemoniyê li Rojhilata Navîne, yanî Îsraîl û Îran, wek Tirkiyê û Siûdiyê Erebiye, her çar dixwazin bibin hêzên hegemon ên herêmê, ji bo vê yekê şerê xwe demek dirêj dimeşînin ku di axa Sûriyê de, carinan li Xeza û Lubnanê şerê xwe dikin. Lê niha şer ketiye navbera Îran û Îsraîlê. Ez bawer dikim ev şer heta demekê berdewam bike ku yek ji wan bikaribe hêza xwe ya serdest li hemberî yê din misoger bike. Wisa xuya dike ku Îsraîl dixwaze bi lewazkirin û binxistina Îranê, hêza xwe ya hegemon misoger bike. Piştre jî ez bawer dikim ev şer dê li Rojhilata Navînê berdewam bike, heta ku yek ji wan çar hêzên ku min nav kir, bibe hêza hegemon a herêmê. Di niha de xuya dike ku Siûdiyê Erebiye hêza leşkerî, têknolojî û însanî tune ye ku bikaribe bibe hegemonê Rojhilata Navînê, ji bo wê jî dixwaze kêlekî Amrîkiya û Îsraîlê ji dûr ve binere, carinan jî bi Tirkiyê re danûstandinê dike, ji bo vê jî naxwaze ku Îran bi awayekî hêsan biçe. Tirkiyê hêza leşkerî heye, lê di warê aborî de pirsgirêkan jiyan dike, ji ber vê yekê niha ew jî ketiye fikarê ku belkî hêdefa piştî Îranê, Tirkiyê be.

Ev şer şerekî piralî ye. Hem Rêber Apo û hem jî partiya me wek PJAK ser vê mijarê lêkolîn, analîz û şîrove kirine. Em bawer dikin ku ev şer dê berdewam bike û mirov dikare bêje ku ev şerekîkevine. Wekî mînak, di salên 1991’an de hemberî Sedam Hisên hatî meşandin, piştre 2010’an derbasî Sûriyê bû û heta ketina rejîma Baas jî berdewam kir. Niha jî ketiye Îranê. Ev şer dê heta guhertina rejîma Îranê berdewam bike. Belkî di demekî nêzîk de nikaribin guhertinek ku dixwazin çêkin, lê heta ku li Îranê sîstemek nû bê avakirin an jî bê guhertin bi awayekî ku ji aliyê wan ve hatibe dîzayînkirin, wê şer hebe. Mirov dikare bi awayekî din jî vî şerî bigre dest ku ev şer şerê hêzên dewletî ye, ango netewdewletên ku li herêmê hatine avakirin. Şer di navbera wan de ye û tu berjewendî ya gelan tê de tune ye. Ji ber vê yekê, ev ne tenê şerê Îsraîl û Îranê ye, hêzên din hene ku vê şerê dimeşînin û berjewendiyên wan ne yên gelan in. Herwiha ev şer şerê hegemoniya Rojhilata Navîn e û hemberî gelan e, ew gelên ku bi salan li vir jiyan kirine û dixwazin jiyana xwe bidomînin. Ji xwe bi salan li herêmê şerekî kûr tê meşandin û ev şerê niha jî berdewamiya wî ye. Wekî Rêber Apo jî gotiye: “Ev şer şerê dîzayînkirina nû ya Rojhilata Navîn e û diyarkirina hêza hegemon a nû ye.”



**Girêdayî êrişên ku li Îranê tên kirin, Rêber Apo dibêje; sê xet derketine holê, ya yekemîn, xeta Dewletên Yekbûyî yên Amerîka û Îsraîlê. Ya duyemîn xeta parastina statukoyê ya hin hêzên navneteweyî û herêmî ku Îngilistan serkêşiyê jê re dike. Xeta sêyemîn jî, xeta jiyana hevpar û demokrasiyê ye ku bi Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk tê parastin. Hûn van her 3 xetan çawa dinirxînin?**

Em van her sê xetan dibînin. Em dizanin ku Rojhilata Navîn di demekê piştî şerê yekem ê cîhanî de hat dîzayînkirin û di wê demê de Birîtanya li herêmê bû. Birîtaniyan hin dewletên nû çêkirin, li Îranê dewletnetewekî bi derbeya leşkerî ava kir, li Tirkiyê jî heman tişt çêbû. Hin welatên nû ji bo Ereban, bi taybetî Sûriyê, Îraq, Lubnan û Urdin, hatin dîzayînkirin. Piştre bi awayekî hiştin ku welatê Îsraîl jî wek dewletnetewekî ji cihûyan re çêbibe. Niha ev dîzayîn zêdetirî sed salan ser re derbas bûye. Ew hêzên hegemon ên herêmî wek Tirkiye, Îran, Siûdiya Erebiyê û niha jî Îsraîl piştî demkê li wan zêde bûye, ew dixwazin statuya xwe biparêzin. Bi taybetî Tirkî û Îran dixwazin statuya heyîna kevin biparêzin ku nêzîkî sed sal e dewletneteweyên xwe bi alîkariya Birîtanyayê ava kirine. Di wê demê de ev dîzayîn ji bo birêvebirina berjewendiyên hêzên kapîtalîst ên cîhanî û modernîteya kapîtalîstî bû. Herwiha ev hêz dikarin wisa werin şirovekirin ku di hemberî sosyalîzm û komunîzma Yekîtiya Sovyetê de wek çemberekî astengdar xebitîn, da ku pêşî li belavbûna wan ber bi Ewropayê ve were girtin. Di vê çarçoveyê de rol û misyonekî girîng lîstin. Niha jî wisa xuya dike ku bi taybetî piştî şerên ku Amerîka li Rojhilata Navîn kir, bi taybetî piştî 11’ê Îlonê 2001’an, piştî Buhara Erebî û şerê Sûriyê, dîzaynekî nû tê xwestin ku li herêmê were avakirin. Em dizanin ku behsa rêyên tranzîtê tê kirin, ew rêya ku heye dixwazin guhertin tê de çêbikin û Îsraîl bibe navenda aboriya cîhanî. Armanc ew e ku rêyên tranzîtê yên aborî ji Îsraîlê re derbas bibin û bi vî awayî hêza aborî û leşkerî ya Îsraîl wek hêza hegemon a herêmê were tesbîtkirin. Ji bo vê yekê, ew hêzên ku berî sed salan bi taybetî ji aliyê Birîtanyayê hatibûn çêkirin, têne lewazkirin û bêbandor kirin, da ku hêzeke nû ya hegemon li şûna wan were. Ev hemû di çarçoveya siyaseta Îsraîl û Amerîkayê de tê kirin, hêzeke hegemon û impîryalîstî ye ku dixwaze herêmê li gorî berjewendiyên xwe ji nû ve dîzayîn bike.

Lê em dizanin ku herêma Rojhilata Navîn herêmekî pir kevin e, bi hezarên salan gelên vê herêmê bi hev re jiyan kirine. Şer tê de hebûye, welatên cuda hatine û çûne, lê dîsa jî ev gel bi hev re jiyan kirine. Gelên Kurd, Tirk, Ereb, Faris û herî dawî jî Cihû hatine herêmê. Lewma em wek gelên herêmê dixwazin bi hev re jiyan bikin ku hêzekî demokratîk, civaka demokratîk û hêzekî modernîteya demokratîk li herêmê ava bikin. Em li ber xwe didin ku em jiyan bikin û em aliyekî wan şeran nînin. Em wek gelên herêmê tu aliyekî van her du şeran nînin, an jî tu aliyekî wan ferasetên ku dixwazin hêza hegemon a xwe serdest bikin, nînin. Çi ew hêzên cîhanî ku berê Birîtaniya nûnertiya wan dikir û niha jî Îsraîl û Amerîka bi hev re bi taybetî Amerîka ku mirov dikare bêje nûnertiya hêza hegemon a cîhanî ya modernîteya kapîtalîstî ye û çi jî di aliyê din de hêzên hegemon a herêmî wekî Tirkiyê û Îranê ku tenê berjewendiyên xwe dihesibînin. Bi taybetî Tirkiyê û Îranê wek du dewlet-neteweyên kevin ên herêmê ku li ser mîrata împaratoriyan hatine damezrandin û çêkirin wekî împaratoriya Sefewî û Qacar li Îranê û piştre jî împaratoriya Osmanî dixwazin rewşa heyî berdewam bikin. Ji bo wê ev şer di navbera hêzên hegemon ên ku bi salan hatine çêkirin û hêzên ku dixwazin sîstemê ji nû ve ava bikin de ye.

Hem jî ev ne şerekî hêsane, şerekî pir zehmet û dijwar e ku bi kuştina hezaran û belkî sed hezaran mirov berdewam dike û ji bo gelên herêmê zehmetî, metirsî û tehlûkeyên pir mezin bi xwe re tîne. Em jî wek hêzên ku girêdayî civakên demokratîk û gelê xwe ne, erkê me yê sereke ev e ku xwe ji van şeran dûr bigirin, gelê xwe biparêzin, birêxistin bikin û ji her derfetê ku dikeve destê me, em hewl bidin herêmê bi giştî ji nû ve demokratîk bikin, demokratîze bikin. Herwiha erka me ya sereke ye li Rojhilatê Kurdistanê, wek hêza PJAK û wek hêzên ku girêdayî bîr û baweriyên demokratîk in, divê em bikarin gelê xwe ji metirsî û xeteriya vî şerî dûr bigirin û heta ku em dikarin derfetên heyî bikar bînin bo demokratîkkirin û birêxistinkirina civaka xwe.

**Niha bi vî şerê heyî re, rewşa Rojhilatê Kurdistanê û Îran di çi astê de?**

Şerê niha şerekî du alî ye, aliyek Îsraîl û Amerîka wek hêza hegemon, aliyê din jî Îran wek hêzekî herêmî. Her du alî bi salan ji bo vî şerî amade bûne. Îran sîstema muşekan bi berfirehî ava kiriye. Îsraîl jî çekên pêşketî xistiye destê xwe de, da ku hêza xwe li herêmê zêde bike. Li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê rewş pir zehmet e. Têkilî û internêt qut bûye, girtin û darvekirin zêde bûne. Her roj girtiyên siyasî tên darvekirin. Herwiha navendên partiyên Kurdî li Başûrê Kurdistanê hatine armancgirtin û gelek pêşmerge şehîd bûne. Lê her çend rewş giran e, jiyan berdewam dike û gel hêvîdar e. Bi taybetî PJAK wek partiyeke serek li Rojhilatê Kurdistanê ku rêxistinê xwe yê leşkerî heye, hem rêxistinê xwe yê siyasî û civakî birêxistinkirî ye. Di heman demê de hewldanekî wê heye ku bikaribe ji vê rewşa şer ku çêbûye, guhestinekê tê de çêke ku civakê birêxistin bike û di pêşerojê de Rêveberiya Xweser a Demokratîk li Rojhilatê Kurdistanê ava bikin. Çawa li Başûrê Kurdistanê rêveberîk û xweserîk wisa heye, li Rojavayê Kurdistanê ji bi awayekî din xweseriyek heye. Em jî tiştekî wisa plan dikin, lêbelê, şer, tirs û xeterî hîn jî pir zêde ne û gelek sivîl jî ku dibêjin derdorê 100 kes li Rojhilatê Kurdistanê şehîd bûne. Bi taybetî li bajarê Karmînşah, Sine û Urmiye hema bêje her bajarekî ji wan 2 sê kesan şehîd bûne. Niha rewşa Îranê bi vî rengî ye; têkilî tine, rewşa aborî pir zehemt e, pir kar hatine sekinadin, dibistan û hemû navendên hikumî hatine girtin û zêdeyî mehekê rewş rewşa şer e. Lê em hêvî dikin ku ev bibe derfetekî em Rojhilatê Kurdistanê ber bi demokarsî û rêveberiya xweser a xweseriya demokartîk, bibin.



## 3 daxwazên Rêber Apo

**Farûk Sakik**

Li hin deveran hin kêmasî dibin. Ev kêmasî tên temaşekirin. Midaxele nayê kirin. Bi taybet li dijî Rêber Apo û tevgera azadiyê kampanyayeke reşkirinê dest pê kiriye.

Pêngava aştî û civaka demokratîk ev salek nîve dewam dike. Rêber Apo bi peyaman paradîgmaya xwe ji civakê re pêşkêş dike. Heyeta Îmrali van raman, nêrîn, nirxandin, analîzên wî bi civakê re pir qels û dereng, carnan jî hîç parve nake. Ev dibe sedem hin tişt nayên zelalkirin. Di rewşek wiha de ew dijminên doza Kurdistan dikevin dewrê.

Mesela; di dema ‘şerê Rojava’ de nêrîn û midaxeleya wî pir dereng bi raya giştî re hatin parvekirin. Heger midaxeleya wî nebûya gelek tiştên xeter pêk bihatina. Êrişên li dijî Rêber Apo dest pê kirin. Kesî bersiv neda van êrişan. Piştî ku peyman hat îmzekirin, me dît ku Rêber Apo rolek çawa lîstiye.

Paradîgmaya wî ya ‘entegrasyona demokratîk’ di notên hevdîtinan de bi awayek zelal hetibû tarîfkirin.

Herî dawî di 27’ê Adarê de di hevdîtina bi dewletê re hin şertên dayî pêş dewletê bi civakê re nehatin parvekirin. Pervîn Buldan di axaftinek xwe de ev civîna bi dewletê re piştrast kir. Lê behsa hin detayan nekir.

Rêber Apo ji dewletê 3 tişt-şert dixwaze. 1. Di destûra bingehîn de peyva Tirk çawa derbas bibe divê peyva Kurd jî wisa cîh bigire. 2. Ji dibistana seretayî hetanî zanîngehan Kurdî bibe zimanê perwerdeyê. 3. Di qanûnan de çiqas astengiyên li pêşiya nasnameya Kurd hene werin rakirin.

Çima bi civakê re ev nehatin parvekirin nayê zanîn. Heger bersiv ‘dewlet wê aciz bibe’ were gotin, ev bersivek ne rast e. Ocalan van şertan li gel heyeta DEM partî bi kar tîne ku bi civakê re parve bikin. Ji civaka Kurd re bêjin; Rêber Apo di muzekereyan de ev 3 daxwaz da pêş dewletê. Heger ev heyet van tiştan bi rayagiştî re parve neke çima li wê derê ye.

Rêber Apo çi digot? Me 50 sal berê ji bo doza Kurdistanê têkoşîna çi dabe destpêkirin, îro jî ji bo bidestxistina wan em ê têkoşîna xwe bidomînin. Êdî ne bi çek, bi siyaseta demokratîk. Ev tevger û ev rêber 50 sal berê jî, ji bo van 3 mafê Kurdan bi rê ketibûn. Çima, îro ev daxwaz dewletê aciz bike? Dewletê jî 50 sal berê dizanibû ku Kurd van 3 mafên xwe dixwazin.

Dema ku ev serdema nû dest pê kir, wan jî behsa sed sal berê biratiya du gelan dikir. Wan jî digot; sed sal berê ev 3 mafê Kurdan hatibûn înkarkirin. Dewletê ev înkar wek xetayek dîrokî dîtibûn.

Berî 50 salî dema ku Koma Apociyan dest bi têkoşîna van 3 daxwazên esasî kirin. Li zanîngehan xwendekar dîhatin birêxistinkirin, derbasî Kurdistanê bûn, bi gel re axifîn û ew îknakirin.

Di salên 90 de êdî gerîla derket qada têkoşînê, şer kir û gel rakir serhildanan. Îroj divê têkoşînek dijîtal were meşandin. Tevgera azadiyê giraniya têkoşîna xwe bide mediya civakî. Siyaseta demokratîk bi tenê bi DEM partî re nayê meşandin.

Di roja me de êrîşên mezin bi giranî li ser media civakî tê bikaranîn. Dive di van platforman de bersiv were dayin anjî nîrxên di hedefa êrişan denin werin parastin.

Tevgera Azadiya Kurd bi qasî du salan bi fedakariyên mezin pêvajoyê dimeşîne û pêşniyarên çareseriya demokratîk ji hêla Rêber Apo ve hatine pêşxistin. Lê em li dinêrin ku rayedarên dewletê hên jî zimanên xwe yê dijminatiyê neguhertine. Heger di gotinên “hesasiyetên dewletê hene” israr were kirin, heger israra peyamên Rêber Apo jî civakê were veşartin dewam bike, zimanê aliyê dewletê yê dijminatî wê neyê guhertin.



# Ji çiraxên hunera Kurdî

**Can Yûsiv**

Hunermend Leyla Agirî; Stêrka Efrînê ya ronak ku ji salan ve şeveqa wê melûl nabe.

Jina kurd bi xwendina stran û mewalên folklorî û yên din dîroka xwe vedibêje, wekî rewşa jin û keçên Efrînê , ku bi dengên xwe dîrok û tekoşîna jina kurdî vedibêjin, di nav wan de jî , hunermend û dengbêja kurd, Leyla Agirî, ku bi dengê xwe yê xweş û zelal beşdarî vejîna kelepûra Kurdî a resen bûye

Hunermend Leyla Agirî, keça bajarê Efrîna birîndar, ew di himbêza xwezayê û di nav razên wê de , û di nav zeviyên zeytûn û meywên tirî , li bin sîberên Tû û Hinaran de mezin bûye, ku xweza fêrkera wê ya yekemîn bû, û sura bayê yekemîn mamosteya wê ya awazê bû.

Hinêra wê li ser awazên dengên bilbil û şalûran vebû , ji pestînên pirpirîkên li ser rûçikên gulan, û ji xuşîna ava çemê Efrînê û xumxuma pêlên sûlavên Meydankê û ji qêrîna cobaran ku di nav geliyan re diherikin ,wê ji wan strana xwe ya yekemîn vehûnand û ji wan çavkanîyan zanistên hunerê vexwart, dengê xwe di axa welatê de vekolî, da ku geş bibe di wijdana her kesê ku wê bibhîze ,wek straneka ku qet navemire û hesreteka ku qet dawî nabe.

Leyla Agirî di 17ê Adarê 1979’an ji dayîk û bavek kurd (Arif û Fatîma), di gundê Badîna ya girêdayî navçeya Raco ya herêma Efrînê hatîye dinyayê ,ew bajarê ku her dem hatiye nasîn wekî dergûşek bo folklora kurdî, wargehek bo huner , çand û nasnameya kurdî, û çavkaniyek ji bo hunerên gel û bîranînên wan ên zindî .

Ew di himbêza malbateke welatparêz de mezin bû, ku bawerî bi Kurdayetî yê kir wek rêgezeka jiyanê, û bi azadî yê wek nirxekî bêhempa.

Di kolanên gund de , û di navbera zevî û buxçeyan de, ku xweza diaxive bi awazên giyanê, yekem nîşanên hişmendiya wê vekir, ji ba û xaka Efrînê bi ruhê xweparêziyê firşk bû , li wir, di bin bandora çîrokên gelêrî folklor, û pestînên dayîkan, stranên palevanan, tovê hunerê dest bi şînbûnê kir di kûrahiyên dilê wê de û di wijdana wê de awazek afirî ne mîna ya kesekî din bû.

Ew li ser nirxên rûmetê, hezkirina xakê û azadîya vegotinê perwerde bû, û ew bû tovê yekemîn ji bo rêwîtiya wê ya hunerî û mirovahiyê .

Ji wê jîngeha tije bi hesret û çîrok, dengê wê derket û nîşanên kesayetiya wê hatin avakirin, paşê ew bû yek ji dengên jinên kurd yên herî navdar, ew bû dengek ku ji bo çiya distirîne, ji bo bêrîkirinê disoje û bi hêvîyan geş dibe, wekî ku her tim stranek be ku li welatekî digere.

Meylên wê yên hunerî û hezkirina wê ya ji bo stranbêjî û mûzîka kurdî ji temenek piçûk dest pê kir, gava hêj wê heft sal derbas ne kirbû, nîşanên hinêra wê destpêkirin û dengê wê yê xweş û zelal diyar kir mîna bayekî hûnik ku ji çiyayên Kurdistanê dibare , dengek ku diherike dilên li derdorê xwe û mizgîneyek dide bi xwedêdana hunermendeka ku di pêlpêlokên dengê xwe de , bangên çiya, germahiya kelepûr û rastiya xweparêziyê hildigire.

Di germahiya hewesa xwe de ya gurbûyî de, di deha saliya xwe de, di sala 1989ê, tevlî koma “Engîzek” dibe û heta sala1996ê bi wê re berdewam dike , û bi rolên stranbêjiyê û şanogeriyê bi bawerîkî ji temenê xwe zêdetir û dadikeve li ser dikeyên şanoyê bi dilê zarokekî û bi rûhê hunermendekî.

Di wan salan de, ew bi koma Engîzek re li Helebê, Efrîn û gundewarên wê di geriya , ji bo vejînkirina konser û dewatên gelêrî, û dengê xwe terxan kirbû ji bo piştgiriya şoreş , şoreşgeran û tevgera rizgariya Kurdistanê.

Li wir, wê taybetmendiyên hebûna xwe ya yekem di bîrdanka temaşevanan de xêz kir û dengê xwe terxan kir wek hêviyek piçûk di demekî de ku gotin deriyek bû ji bo berxwedanê, û stranek bû ji bo parastina nasnameyê ,piştra, ew di sala 1996’an de tevlî koma Agirî bû , jêhatîbûna xwe ya stranbêjiyê bêtir pêşxist û xurtkir û fêrî bingehên stranbêjî û muzîka kurdî bû, û bi dengê xwe yê xweş û zelal di nava koma

Agirî de dengda .

Bandorek kûr ya hunermendên Efrînê li ser avakirina hişmendiya wê ya hunerî hebû ,mîna (hunermend Ednan Dilbirîn, Bavê Selah, Umrî Cemlo, Elî Teço, … hwd.),herwiha gelek hewesên din jî yên wê hebûn ji bilî stran û muzîkê ,, ew berê beşdarî beşê dîlan , şano û tabloyên hunerî jî bibû , xewna wê ewe ku di fîlmên sinemayê de jî beşdar bibe.

Ji şanoyên û tabloyên hunerî yên herî navdar ku ew tê de beşdar bûye:

1. Pîr û Kal
2. DAIŞ
3. Efrîn Yek
4. Gur û Bez
5. Sêvê

Hunermend Leyla Agirî di sala 1999’an de zewiciye, û ew dayika sê zaroka ye ( keçek û du kur).

Rêwîtiya wê bi koma Agirî re heta sala 2018ê domand,lê şert û mercên wê yên malbatî û berpirsiyartiya wê ji bo xwedîkirina zarokan hişte ku ji hunerê demekê dûr bibe.

Lê bi destpêkirina Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ew bi hêz vegeriya qadên hunerî, wê di rêveberiya gelek komên hunerî yên kurdî de roleke girîng lîst, wek koma “Engîzek ”, koma “Agirî ” û koma “Berçem”, û di heman demê wê çavdêriya Navenda Çand û Hunera kantona Efrîn jî dikir.

Di wê qonaxê de, wê di nav komên hunerî û her weha bi awayek kesane jî stranên şoreşgerî û welatparêzî pêşkêş dikir, û di heman demê de di gelek karên hevpar ên bi hunermend û komên cûda yên Kurd re jî beşdar dibû, bi taybetî bi koma Agirî re , wê gurzek stranên şoreşgerî pêşkêş kir, mîna strana:

1- Her der bûye Serhildan
2- Roj roja me kurdaye
3- Kobanî Kobanî .
4- Newroz Roja Azadîye
5- Ezim Herîma Efrîn
6- Dehola Gurme Gurme.

Û di koma şehîd Berçem de jî beşdar bû strana ( Yekîtiya Star) .

Leyla Agirî bi beşdariya ahengên neteweyî û festîvalên muzîkî wê bi xwe re dengê Efrînê, bîra axê û nebeza nasnameyê hilgirtibûn , dengê wê mîna gulên Nîsanê li her derê Kurdistanê belav dibû.

Heta ku sala 2018’an hat, sala birîna vekirî, sala şikestina mezin û koçberiya xemgîn; gava ku leşkerên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê bajarê Efrîn dagirkirin û xewna kurdî dibin zencîreyên tankan de kuştin, bi hezaran malbatên kurd ji kokên wan qutkirin, gelê wê bi darê zorê ji warên wan derxistin û mirov ji germiya malên wan derbiderkirin ber bi konên xurbetê û rêçikên nenas, Leyla û malbata xwe jî ji wan kesan bûn ku dagirkerîyê ji axa wan ew dûrkirin , wan li paş xwe hiştin war û bîranînên xwe, ew bi ruhekî birîndar,tijî ji xeyal û hesret û bêhêvîtî derketin, li panahiyekê digeriyan di dema tirsê de.

Ew bi zorê koçberbûn , di nav kampa û bajarên de derbas dibûn, Efrîn di dilên xwe de, di torikên bîranînê de hildigirtin, wan berê xwe da ser rêya nenasî yê , bûn koçber li welatên dûr, ji bajarekê ber bi bajarekê din derbas dibûn û ji kampekê bo kampa din, di dilên wan de hezar hesret, derd û kul, heya ku çavên wan ji rondika zuhabûn , û giyanên wan wek şemalan heliyan , êş û hesret û bêrîkirina wargehan hestiyên wan sojandin û dilên wan parçe kirin , her kêliyê bêrîkirina xaka bav û kalan û sîberên darên zeytûnan û germahiya bîranînan di dilên wan de gurr dibû.

Lê Leyla ne şikest ,ew ji bin kavilên wêranbûyî mîna straneka rikdar rabû, di dawiyê ew digel malbata xwe li bajarê Hewlêrê bicih bû ,li wir, di nav xemgînî û koçberiyê de, stêrka wê ji nû ve di ezmûnê Kurdistanê de ronahî da , di huner û stranbêjiyê pêşket, û geşbû di nav xemgîniyê de wek çiraxeke ku qet na vemire, û vedenga gewriya wê ya zêrîn di her derê welatê birîndar de bilind bû, bi xwe re hildigirt bû peyamên huner û berxwedanê, wê ji bo jiyanê û hêvîyê, ji bo Efrîn û koçberan û ji bo dilên ku hêj li benda vegerê ne stran digot, û bi dengekî hêzdar ji bo hemû cîhan digot:

“Em li vir in, tevî sirgûnê dimînin,
pêdarin tevî êşê
Bêguman emê vegerin…Bo Efrînê.”

Dengê wê bû kiryareka berxwedanê, nebezeka dilên koçberan, û sozeka ku Kurd tucaran ji axê qut nabe , lê her carê ku ew hewl didin wî dûrbêxin, ew pêtir di axê de rayê xwe berdide .

Di tarîya koçberiyê de, Leyla bû dengê wan kesên bê deng , û şemaleka ku qet venamire di bîra Kurdistanê de, şevê mişextiyê ronî dike û ji her kesê ku hewl dide jiyana kurda bin pê bike re digot :

“Em hîn jî li vir in...
Dilên me ji bo Efrînê dijenin ,
Welat , em di dengê xwe de hildigirin,
di her awazekê de,
em rêya vegerê ava dikin.”

Leyla bi dehan stranên şoreşgerî û welatparêzî pêşkêş kir,
û beşdarî pîrozbahiyên neteweyî û cejnên Newrozan bû , dengê wê di her meydan û ahengê de derdiket pêş, şemala hêvî hildigirt û aleya nasnameyê bilind dikir.

Ew bû berteka êş û hêviyên civakê û neynika nebeza kolanê û ruhê şoreşê .

Ew bû dengê evîndaran ji bo welat, ji bo azadî û rastîyê , wê ji bo Kurdistan û şoreşê stran gotin , her weha ji bo evîn û nirxên pîroz, ji bo jin û azadî, , ji bo şehîdan û dozê.

Bi dengê xwe derbirîna xewna



kurdî dikir, bi hemû hestên xwe yên pêdarî, rûmet û dilsoziya ji axê re..

Ji stranên wê ên taybet yên herî navdar:

1– Çemê Efrînê
2– Newroz
3– Sonda Gura
4– Sînemê

Bi van berhemên xwe, Leyla ne tenê hunermendeke ku stranên dixwîne , lê ew bû dengê dozê , parêzvanê bîra gelê xwe , bi peyv û awazên xwe wêneyê neteweyekê ku naşike, û dengê xakeka ku qet namire afirand, ew bi dengê xwe re diçe wekî kesê ku di şevên tarî de çiraxekî pêbêxe, û ji her kesê ku lê guhdarî dikê re dibêje:

“Em li vir in,
Dengê me bêdeng namîne,
Stranên me dê qet ji bîr nebin. “

Hunermend Leyla ew bi tecrubeya duetan û komanî ya stranbêjiyê rabû, bi gelek navên ronak ên li qada kurdî re stran gotin, wek( Saîd Bîrhat, Sîpan Efrînî, Bengîn Efrînî, Xunav, Şehrîban û yên din) , bi baweriya wê, dema ku stran bi dengek komeleyî tê xwendin, ew ji awazekî takekesî vediguhêre ruhek komeleyî, û ji yek dengekî didibe vedenga neteweyek tevahî.

Hunermend, Leyla, gelek bawernameyên rêzgirtin û afrîneriyê ji saziyên hunerî û çandî werdigirtin, rêzdarî ji bo kariyera wê ya stranbêjî ya tije ji dayînê , û dengê wê, yê ku dilsoz mayî ji nasname û wijdanê re, wê bala gelek kanal û rojnameyên Kurdî kişande ser xwe wekî (Ronahî, Rûdaw, Rojava û yên din ..), Ku gelek hevdîtin bi wê re çêkirin, û tecrubeya wê ya stranbêjiyê û peyama wê ya hunerî ronîkirîn.

Her weha rojname û kovarên edebî û hunerî jî li ser wê nivîsandin, mîna( Evro û Ronahî) ku dengê wê yê germ û şêwazê wê ku hevbexşiyê dike di navbera kovan hêzê de û derbirîna kûrahiya dilê mirovê kurd û hesretbûna wî ji bo azadî nîşan dide.

Daxwazên min ji bo hunermenda hêja Layla Agirî , serkeftin û afrînerîyek zêdetir.

# Şaredariya Qamişlo dest bi çaksazkirina kolanên xirabûyî kiriye

Şêniyên Qamişlo ji bo çareserkirina pirsgirêka kortên di nava rêyên sereke de, bang li şaredariyê kirin. Endamê Beşa Lêkolînan a Şaredariya Qamişlo Hesen Hisên diyar kir ku şaredariyê ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê dest bi kar kir û got, "Ji ber şert û mercên avhewayê xebatên me têne rawestandin."

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Kortên ku di nava kolanan û li ser rêyên sereke ji pirsgirêkên herî sereke ne di bajarê Qamişlo de, nemaze ji ber barîna zêde ya baranê di dema dawî de hişt ku ev korta zêde bibin, di encamê de şêniyên bajarê Qamişlo wekî însyatîfên kesayetî van kortan bi axê digrin lê ev yek têrê nake di heman demê de bang li şaredariyê dikin ku destwerdanê bike û çareseriyke demkî ji pirsgirêkê re deyne.



**Zirarên kortan**

Gilî û gazinên şêniyan bi taybet yên ajokaran li bajarê Qamişlo ji ber rewşa xirabûna rêyên sereke zêde dibin. Li kolanên sereke û yên alî kortên pir zêde hene, ev yek dibin sedema xirabûna wesayîtan û zehmetiyên rojane yên şêniyan girantir dikin.

Pirsgirêk di demên dawî mezin de bûye ji ber barana zêde a ku kortal bi avê tijî kiriye û hiştiye ku kortal kurtir bibin, di encamê de zirarên mezin gihaştiye li wesayîtên gel, di nav de xirabûna dûlaban û beşên mîkanîkî.

Ji ber nebûna çareseriyên tavilê, şêniyan hewl didin ku kortalan bi kevir û axê tijî bikin. Lêbelê, ev çareseriyên demkî zû têk diçin ji ber ku baran û trafîka giran berdewam dikin, di encamê de pirsgirêk hîn xirabtir dikin.

**Sedemên xirabûna rêyan li Qamişlo**

Di vê çarçoveyê de, Şaredariya Gel diyar kir ku gelek rêyên bajêr kevn in û pêdivî bi nûjenkirineke berfireh heye, di nav de rakirina qatên ziftê yên kevn berî ku projeyên nû yên nûjenkirinê werin bicîhanîn. Herwiha bal hat kişand ser zehmetiyên din, di nav de kalîteya nebaş a madeyên ku di salên dawî de hatin bikar anîn, lewma şaredarî niha tenê madeyên xwecihî rêyan çêdikin.

Şaredariyê zêde kir ku berî ew dest bi ziftkirina kolanan dikin agahiyan didin şêniyan da ku kanalîzasyonên xwe çêbikin û çend mehan li hêviya milet dimînin, lê belê dîsa jî zehmetî li hember şaredariyê derdikeve, ji ber ku piştî ziftkirinê şênî ji bo xetên xwe yên av û kanalîzasyonê rêyan dikolin. Bi vî awayî zifit xerab dibe û kortikên bê serûber çêdibin.



**Ji bo çareserkirina pirsgirêkê çareseriyên demkî**

Di vê derbarê de Endamê Beşa Lêkolînan ya Şaredariya Qamişlo Hesen Hisên ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku wekî çareseriyeke demkî ji bo pînekirina kortalan hin tedbîrên tavilê hatin girtin û wiha anî ziman: "Ev tedbîr çareseriyek demkî ye, ne çareseriyek daîmî ye, heta ku xebata çêkirina rê û tamîrkirina rêyan wekî beşek ji plana pêşerojê ya sala 2026'an dest pê bike. Em hewldanên berdewam ên tîmên xwe yên teknîkî ji bo şopandina rewşa rêyan û xebata li ser baştirkirina binesaziyê ji bo xizmetkirina xelkê bajarê me piştrast dikin."

Hesen Hisên wiha gotina xwe qedan: "Ji berî çend rojan ve me dest bi pînekirina kolanên serke kiriye, ji çerxerêya nêzî navedna Mihemed Şêxo destpê kir û heya çerxerêya Şehîdan ya nêzî bazara Qamişlo. Pê re em dakevin kolanên din, lê niha em li bendê ne ku rewşa avhewayê baş bibe da ku em dest bi xebatan bikin, ji ber ku bi sedema barîna baranê kar û xebatên me tên rawestandin. Pînekirina rêyan wê ji hêla du aliyan bê kirin, yek ji hêla me wekî Şaredariya Qamişlo di riya kampaniyan û ya din jî di riya Avahîsazan wê pêk were. Ev tebîr wê demkî bin ji bo bersivdayîna gilî û gaziên milet bi taybet yên ajokaran e. Êdî bi destpêkirina projeyên sala 2026'an em ê hewil bidin van pirsgirêkan bi awayekî daîm çareser bikin."

**Hêviyên başkirina rastiya xizmetguzariyê**

Şêniyên bajarê Qamişlo hêvî dikin ku ev tedbîr dê bibin alîkar ku zirara rojane kêm bibe, di heman demê de li benda çareseriyên daîm in ku aliyên peymwendîdar hewil bidin ku rêyan û binesaziyê sererast bikin di heman demê de rewşa xizmetguzariyan li bajêr baştir bikin.

# Ajokar ji ber kêmbûna sotemeniyê gazinan dikin

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

**Ajokarên bajarê Qamişlo ji ber kêmbûna sotemeniyê astengiyan dibînin. Hevserokê Desteya Sotemeniyê ya kantona Cizîrê Izedîn Ferhan diyar kir ku tu guhertin di buhayê sotemeniyê de tune ye û ew hewil didin pirsgirêka kêmbûna sotemeniyê çareser bikin.**

Ji ber geşedanên leşkerî û siyasî yên dawî li ser sînor û rêyên sereke, veguhastina sotemeniyê di navbera bajaran de bi zehmetî pêk tê. Di vê dema dawî de mazot û benzîn kêm bûye û milet ji ber wê gazinan dike.

**'Ev demek e mazot û benzîn kêm bûye'**

Yek ji ajokerên erebeyên servîsan yê bi navê Ismayîl Mehmûd anî ziman ku ev demeke mazot û benzîn li bajarê Qamişlo kêm bûye, ji ber wê ew astengiyan dibînin û wiha got: " Piştî cejina Remezanê mazot û benzîn bi awayekî berbiçav kêm bûye, ji ber wê em wekî ajokerên servîsan karê me heta astekê kêm bûye. Em bi rojan li ser banzînxaneyan dimînin da ku em mazotê wergirin, ji ber wê jî em nikarin kar bikin. Mazot li derveyî kaziyan jî tê firotin lê buhayê wê pir zêde ye, ji ber wê em nikarin bikirin."

**'Ji ber kêmbûna mazot û benzînê wê karê me were rawestandin'**

Ismayîl Mehmûd da diyarkirin ku eger kêmbûna sûtemeniyê dewam bike wê karê wan were rawestandin û axaftina xwe wiha qedand: "Eger rewş wiha dewam bike û mazot kêm bimîne, wê karê me were rawestandin. Ev du roj in ez li ser dora mazotê me, min tu kar nekiriye. Rewşa me wiha zehmet dibe. Em bang aliyên têkildar dikin ku çareseriyêkê lezgîn ji vê kirêzê re peyda bikin."



Di derbarê mijarê de hevserokê Desteya Sûtemeniyê yê kantona Cizîrê Izedîn Ferhan ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Ji ber rewşa dawî ya herêmê û êrişan, qerebalix li ser mazot û benzînê çêbû. Niha em her karmendekî sotemeniya jê re pêwist em didinê. Ji xwe buhaya mazot û benzînê nehatiye guhertin wek bûhaya xwe ya berê tê firoştin. Niha hinekî ji ber nezêdebûna sotemeniyê zehme li ser Kaziayan çêdibe. Milet di nava xwe de dibêjin wê sotemenî buha bibe lê ev tiştî neraste. Niha jî me daxwaza sotemenî û benzînê kiriye. Hinek kes sotemeniyê vedişêrin da ku bi bihayên giran di bazara reş de bifroşin, ev jî qeyranê kûrtir dike. Di heman demê de jî kesên li ser matorên Elektirîkê disekinin aloziyan ji sotemeniyê derdixin da ku zêde elektirîkê nedin welatiyan. Ji ber van rewşan alozî dirdikevin holê. "



**Ismayîl Mehmûd**



**Izedîn Ferhan**

Izedîn di dawiya axaftina xwe de bal kişand li ser belavkirina sotemeniyên û wiha got: "Li gor pêdiviyên sotemeniyê em lîsteyê hildidin û li gor wê sotemenî li ser banzçnxaneyan tê belavkirin. Piştire li atombêlan belav dikin. Lê niha ji ber sotemenî kême li ser kaziyan zehme çêdibe. Ji xwe ji bo atombêlên di veguhestina hundirîn de ji wan re 90 litreya mazot derdikeve. Herwiha benzîn ji bo seravîsan di heftiyê de 75 litre ji wan re derdikeve. Li firneyan jî li gor seatên kar em mazotê didin wan. Ji bo matorên elektirîkê em mazotê bi buhaya 25 litreyê Sûrî û bi awayekî hejmarî li gor awayê matoran em belav dikin."



# Idrîs Henan: Çapemeniya Sûriyê di asteke xirab de ye

Hevserokê YRA Idrîs Henan diyar kir ku li Sûriyê rewşa çapemeniyê wekî hemû welatên Rojhilata Navîn di asteke xirab de ye ku mirov nikare behsa ragihandineke azad bike. Li Rojavayê Kurdistanê, rewş hinekî baştire ku rojnamevan dikarin heta astekî karê xwe bi serbestî bikin, lêbelê ev azadî ne li gorî standardên navneteweyî ye, bi taybet ji ber rewşa şer û xetereyên ewlehiyê.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Derbarê rewşa çapemeniyê li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê, hevserokê Yekîtiya Ragihandin Azad (YRA) Idrîs Henan bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Li Sûriyê giştî û li Rojavayê Kurdistanê bi taybet azadiya rojnemevantiyê di çi astê de ye û heta çi radeyê mafê rojnamevanan tê parastin?**

Li Sûriyê rewşa çapemeniyê wekî hemû welatên Rojhilata Navîn di asteke xirab de ye ku mirov nikare qala ragihandineke azad bike. Ne di serdema rejîma hilweşyayî ya Baas û ne jî bi qonaxa îslama radîkal a rejîma HTŞ'ê de. Zihniyeta desthilatdar, navê wê çi dibe bila bibe, weke kevneşopiyek serdestiyê, azadiya derbirînê weke sernavekî ji bona tekûzkirina desthilata xwe diçewisîne ku veguheriya şîrketeke kozmatîkê ya ku rûyê girtin, işkence, wendakirin û hemû cureyên binpêkirinan boyax dike ye. Lewre jî ne lihevhatineke ku azadiya çapemeniyê li Sûriyê di cihek xirab de ye. Ev jî li gorî gelek navend û rêxistinên têkildar hatiye tekezkirin.

Li Rojavayî Kurdistanê rewş hinek cuda ye, lê em nikarin bibêjin ku bê kêmasî ye. Li vir gelek sazî û dezgehên ragihandina di bin siya Rêveberiya Xweser de hatine damezirandin û heta astekî baş rojnamevanên van saziyan û ên serbixwe, karê xwe dimeşînin û gelek mijarên civakî, çandî, siyasî û xizmetguzarî bi serbestî digirin dest. Li vir azadiya çapemeniyê bûye qanûn û di şiklê hevpeymana civakî de xwe daye der ku eynik civakê. Lê tevî van avantajan jî, em nikarin bibêjin ku li gorî standartên navneteweyî ne. Ev jî bê goman ji ber bandora rewşa ewlehî û êrişên li ser hev ên her du rejîmên berê û îro ne.

Bê goman li cihê ku şer û pevçûn hebin, ewlehiya rojnamegeran dikeve xeteriyê û azadiya çapemeniyê sînordar dibe.

**Hûn wekî Yekîtiya Ragihandina Azad ji bo belgekirina binpêkirinên li dijî rojnamevanan û misogerkirina parastina mafê wan, mîkanîzmeya xebatên we bi çi rengî ye?**

Yekîtiya Ragihandina Azad YRA li gorî îmkan û derfetên xwe, hinek gavên pratîk di vê derbarê de avêtine. Di serî de û li gorî rêziknameya YRA, lîjneyek taybet ji bo şopandina binpêkirinên li Sûriyê û Rojavayî Kurdistanê ava kiriye. Ew komîteye bi navê; Komîteya şopandin û hiqûqê ji endamên meclîsa giştî ya YRA'ê pêk tê. Bi tevkariya bi komîteyên dîtir, sazî û rêxistinên mafê mirovan û têkîliyên taybet re, çi binêkirinên li dijî rojnamevanê li ku der Sûriyê derkevin, belge dike û ji cihên têkildar re weke rapor rê dike. Carek din wan binpêkirin arşîf dike û di dawiya salê de weke rapora salan e ya binêkirinan, diweşîne. Ev weke mekanîzmeya şopandinê ye. Aliyê hiqûqa ve jî, rewşên berdest ên werin destwerdan jî hene. Ango destedaba hiqûqî li dijî binpêkirinên di derheqê endamên ragihandinê de li hemberî dadgeh, sazî û dezgehên çapemeniyê.

**Di warê parastina rojnamevanan de saziyê navneteweyî çiqasî bi erkê xwe radibin û têkiliyên we bi wan re di çi astê de ne?**

Em weke Yekîtiya Ragihandina Azad (YRA) têkiliyan bi hemû saziyên navneteweyî yê têkildarî parastina mafê rojnamevanan re, di nav têkîliyê de ne. gelek binpêkirin, êriş û destwerdanê li ser azadiya derbirînê me belge kirine, bi wan aliyan re hatine parvekirin û li gorî wê jî gelek raportên navneteweyî hene ku belgeyên me esas girtine. Weke mînak, vê dawiyê me rojnamevanên ku çarenûsa wan ne diyar û zorê hatine xeybatkirin li arşîfa Komîteya Parastina Rojnamevanan a navneteweyî CPJ, qeyid kirin. Di derberê her du rojnamevanan Ehmed Polad û Êva Mişilman de ku piştî êrişên HTŞ'ê ser Reqayê de, têkîliya bi war qut bûye û çarenûsa wan ne diyar e, me Yekîtiya Navdewletî ya Rojnamevanan IFJ û CPJ agahdar kiriye ku rapor jî li ser wê yekê weşandin û heya niha jî lêpirsîn berdewam in. Her wiha li ser rewşa hevkareke me ya Rojnamevan ku bi çekên dewleta Tirk li ser sînorê Nisibîn – Qamişlo hatibû birîndarkirin raporeke IFJ hatibû weşandin. Di heman demê de têkiliya me bi gelek sandîkayên rojnamegeriyê re li Kurdistanê û cîhanê hene ku bi tevkariya bi wan re em dengê xwe digihîjin her derê.

**Girêdayî rewşa ku rojnamevan li Bajarê Kobanê rastî wê hatin, li ser vê nirxandinên te çi ye û ji bo ev yek dûbare nebe pêwîst e çi were kirin?**

Di dest pê kê de me îşaret bi zihneyta heyî ya desthilatdariya HTŞ'ê kir ku weke domahîka zihniyeta hişk-navendî ku hewl dide bi rêbazê homojen ên netewperest û îslama radîkal, hemû keda dîrokî ya civakê desteser bike. Lewra jî, êrişên li ser hevkarên me yên bajarokê Çelebiyê yê Kobanê, bi armanca nixumandin û tepeserkirina heqîqetê pêk hatiye. Ev jî taybetmendiyek desthilatadariyê re ku xwe weke rastiya mutleq pêş kêş dike û divê her tişt li dora navenda wê ya hiş bigere. Ji xwe bi vê derewa mezin hewl daye otorîteya xwe rewa bike û desteseriyê xwe li ser civakê bisepîne. Em dixwazin bi yekê mesajên ku dibêjin; Em navenda heqîqetê ne, hûn nikarin derveyî perspektîfên me nefes bikişînin! Ji bona wê nameyê jî, rebazên şîdet, êriş û înkarê bi kar tînin û di serî de çapemeniya azad hedef digirin. Li Kobanê tişta rû daye, êrişa hegemonîk a li ser azadiya derbirînê û mafê gelan a hevjiyanê ye. Desthilatdariya ku pala xwe daye îradeya biyanî ya xwerewakirinê, li hundir jî bi êrişên ser çapemeniya azad ve, hewl dide rewatiyê bi dest bixe. Ji bona vê jî em jê re dibêjin, bi metod û elementên berê Baasê bi kar anîne, tu nikarî derveyî hişmendiya Baasê tiştekî nû biafirînî. Îsrara li ser vê hişmendiyê jî, aqûbet Baasê ye.



# Jidayikbûna gelekî û rastiya dîlgirtinê

**Hasan Agaç**

4'ê Nîsanê ne tenê rojek e. Ew qet rojbûnek ji rêzê jî nîn e. Ji ber ku tiştê ku li vir çêdibe ne tenê kesek e; ew wateyek, rêgezek û vîna gelekî ye ku vegere xwe. Ji ber vê yekê, dema ku mirov li 4'ê Nîsanê dinêre, divê mirov ne jidayikbûnek yekane, lê şiyarbûnek civakî bibîne. Ji bo gelê Kurd, ev dîrok vejîna rastiyekê ku ji hatiye bîrkirî ye. Kurdan bi sedsalan li ber xwe dane. Ji Şêx Seîd bigire heya Dêrsimê, ji Agiriyê bigire heya gelek serhildanên din, qurbaniyên mezin hatine dayîn. Lê, ev berxwedan pir caran nekarîne bê domandin. Bêdengbûn, parçebûn û nebûna yêk hevpar her carê bû sedema têkçûyina wan. Derketina holê ya Rêber Apo tam di vê xalê de xalek werçerxê ya dîrokî re nûnertî dike. Ji bo cara yekem, berxwedan ji bertekek demkî derket û veguherî têkoşînek rêxistinkirî û berdewam. Ji ber vê yekê, 4'ê Nîsanê ne tenê rojbûnek e. Ew di heman demê de nîşaneya ji nû ve zayîna gelekî ye, hevdîtina wan bi rastiya xwe re ye. Efsûnîya ku vê jidayikbûnê cuda dike ev e ku ew takekesî nemaye. Jidayikbûna kesekî veguheriye jidayikbûna bi mîlyonan kesan. Ji ber vê yekê, mirov ne tenê 4'ê Nîsanê pîroz dikin; ew hebûna xwe, şiyarbûna xwe di vê dîrokê de dibînin. Ev dîrok dibe navê vîna gel ji bo ji nû ve avakirina xwe. Lê, tam di vê nuqteyê de nakokiyeke mezin derdikeve holê. Tevî hesteke ewqas xurt a xwedî derketinê, tevî wateyeke ewqas kûr ku jê re tê dayîn, xwediyê vê vejînê hîn jî dîlgirtî ye.

Ji ber vê yekê, pirsa ku êdî nayê veşartin ev e: Çima ew hîn jî dîlgirtî ye?

Bersivên ku ji vê pirsê re têne dayîn pir caran rûberî dimînin. Bê guman, hevsengiyên navnetewî, dewletparêzî, an berjewendiyên siyasî heta radeyekê raveker in. Lê naveroka wê rastiyê kûrtir e. Ji ber ku pirsgrêk li vir ne tenê girtina kesekî ye. Mesele hewldana sînordarkirina ramanek, şêwazek jiyanê, û bîranîna gelekê an gelan ne. Ramanên ku têne pêşkêş kirin ne tenê rexnegir in; ew bersivekê jî ava dikin. Dema ku hişmendîya dewletparêz dipirse, ew wê bi şêwazek jiyana komunal û demokratîk diguhezîne. Ji ber vê yekê, tiştê ku ji bo pergalê xeternak e ne tenê tiştên ku têne gotin, lê di heman demê de jiyana ku gengaz dibe jî. Ji ber ku her ku fikra ku civak dikare bêyî dewletek hebe û xwe birêxistin bike xurt dibe, pêwîstiya pergala heyî tê lêkolîn kirin.

Ji ber vê yekê, dîlgirtina Rêber Apo ne tenê fîzîkî ye. Ew di heman demê de hewldanek e ji bo bêbandorkirin, nedîtin û di dawiyê de têkbirina birdozîyekê gel. Sansûra ku niha pêk tê, beşek ji vê yekê ye. Ew sansûra ji bona veşartina li ser rûyê Reber Apo li ser kanalek televîzyonê ya Kurdî ne pirsgirika teknîkî ye; ew hilbijartinek hişmendîyê ye. Mijar ne li ser birîna wêneyek e, lê li ser qelskirina girêdana di navbera gel û serokatî de ye. Ji ber ku heke ew girêdan bê têkbirin, hevgirtin têk biçe, bîr qels dibe û têkoşîn ji hev dikeve. Lê, wêneya ku îro derdikeve holê berovajî vê yekê nîşan dide. Tevî hemî zextan, ew girêdan nehatiye şikandin. Tiştê ku di şahiyên 4'ê Nîsanê de derket holê ne tenê girse bû; ew hişmendî û vînek bû. Mirov ne ji bo pîrozkirina rojbûna kesekî, lê ji bona mîsogerkirina rastiya xwe çûn wir. Lê ev kombûna girseyî bi tenê têrê nake. Ji ber ku hîn jî rastiyek çaresernekirî heye: dîlgirtina Rêber Apo hîn berdewam dike. Ji ber vê yekê, pirsgirêk êdî ne tenê li ser fêmkirin an îdîakirinê ye. Mijar li ser pêşxistina xeta têkoşînê ye ku dê vê rastiyê temam bike. Berî her tiştî, ev mijar divê bibe pirsgirêka tevahiya civakê, ne tenê ji bo dorhelekê teng. Daxwaza azadiyê divê ne tenê di warên taybetî de, lê di her aliyê jiyanê de were meşandin. Lê, divê hest û hişmendî bi hev re biçin. Bi tena serê xwe coş têrê nake, dahûrandin jî bi tena serê xwe têrê nake. Dema ku ev herdu bibin yek, hêzek civakî ya rastîn derdikeve holê. Xala herî girîng xurtkirina şêwazek jiyanek gengaz e. Ne tenê dijber derketin, lê avakirina jiyana xwe xala bingehîn e. Civakek çiqas rêxistin, hevgirtin û vîna xwe mezin bike, ewqas xurttir dibe. Ji ber ku veguherîna rastîn ne tenê bi dijberiyê, lê di heman demê de bi jiyana ku tê avakirin jî çêdibe. Îro, gelê Kurd hîn jî dimeşe. Ew bi nav, ziman û vîna xwe hebûna xwe didomînin. Ji ber ku hin jidayîkbûn ne tenê destpêkek in; ew di heman demê de berxwedanek in. Ji ber vê yekê, mijar ne li ser azadiya kesekî ye. Pirsgirêk azadiya gel, ramanek û jiyanek e. Û heya ku ev rastî neguhere, tiştek bi rastî azad nabe.

# NATO ji damezrandinê heya gefên hilweşîna wê...

Temenê Hevpyemana Atlantîk ya Bakur (NATO) 77 sal in, ew hevgirtina siyasî-leşkerî ya 32 dewletên cîhanî ye. Piştî 77 salan di dema heyî de ku ji ber şerê Amerîka-Israîl li ser Îranê û nebeşdarbûna NATO di şerê li dijî Îranê de, Amerîka gefê li NATO'yê dixwe ku xwe vekişîne û di derencamê de were hilweşandin.

Hemza Sêvo

Serokê Neteweyên Yekbûyê yê Amerîkayê Donald Trump gef li NATO'ê xwar ku ew ê ji vê hevgirtina navnetewî xwe vekişîne, sedem jî ew bû ku endamên NATO'yê yên Ewropî qebûl nekirin ku keştiyên şer herin Kendava Hurmizê û wê kendavê vekin, di nava gefên Trump de gelek rexneyên tund hatin nîşandan ji bo NATO'yê. Trump demeke dirêj NATO bi tundî rexne kir. Di sala 2020'an de, di dema serokatiya xwe ya yekem de, şêwirmendê hiqûqî yê Wezareta Dadê gotarek weşand û diyar kir ku serokkomar tenê biryarê dide di warê vekişandina peymanan û Kongrêsa Amerîkî ne erkdarî vê yekê ye. Trump ji Reutersê re got ku ew ê di axaftinekê de ji gel re ragihîne ku ew 'ciddî' difikire ku Amerîkayê ji Hevpeymana Etlentîk a Bakur vekişîne û destnîşan kir ku ew 'ji NATO'yê aciz e'. Daxuyaniya Trump piştî çend demjimêran ji axaftinên Wezîrê Berevaniyê Pete Hegseth bû dema ku pabendiya Neteweyên Yekbûyî yên Amerîkayê bi berevaniya hevbeş a NATO'yê red kir. Pispor dibêjin ku ne diyar e ka Trump dikare bi yekalî tevbigere da ku ji hevpeymana ku 77 sal berê hatibû damezrandin, tevî ku ew gelek caran biryarên girîng bêyî erêkirina Kongrêsa Amerîkî dide, xwe vekişîne? Destûra Bingehîn a Amerîkayê çi dibêje? Destûra Bingehîn dibêje ku serok xwedî wê hêzê ye ku peymanan bi şîret û razîbûna Meclisa Rûspiyan îmze bike, bi şertê ku sêyek ji parên endamên meclisê ku hejmara wan 100 encam e, erê bikin, lê belê, ew destwerdanê li vekişîna ji peymanan nake.

**Zagonên Hevpeymana Atlantîk a Bakur û Amerîkayê?**

Xala 13 ya Peymana Atlantîk a Bakur ya 1949'an destnîşan dike ku tu aliyek nikare xwe ji NATO'yê xwe vekişîne bêyî ku beriya wê bi salekê peyama vekişînê ji hikumeta Netewên Yekbûyî re bişîne. Heta niha, tu welatekî endamtiya xwe ya NATO'yê betal nekiriye. Qanûna Amerîkî çi dibêje? Di sala 2023'an de, Kongreyê zagon derxist û serokê wê demê Joe Biden ew zagon îmze kir, ku qedexe dike ku her serokekî Amerîkî ji peymana ku NATO damezirandiye rawestîne, biqedîne, betal bike an jî xwe jê vekişîne, ji bilî erêkirina piraniya sêyek ji paran ên Meclisa Rûspyan. Zagon wekî guhertinek li zagona Destûrdayîna Parastina Neteweyî ya 2024'an hate pêşkêşkirin, projeyeke salane ya mezin e ku siyaseta Pentagonê destnîşan dike. Du sponsorên sereke yên guhertinê senatorê demokrat Tim Kaine ji Virginia û senatorê komarê yê wê demê Marco Rubio ji Florida bûn.

**Vekişîna NY'ê ji NATO'yê pêkan e ya na?**

Max Bergmann, berpirsê berê yê Wezareta Derve ku niha wekî rêveberê Bernameya Ewropa, Rûsya û Awrasyayê li Navenda Lêkolînên Stratejîk û Navneteweyî kar dike, got, "Eger serok û artêş ji bo ewlehiya NATO û ewlehiya Ewropayê ne dilsoz bin, ez bawer nakim ku Kongrêsê Amerîkî bi awayekî rasteqîn bikaribe gelek tiştan bike da ku li pêşiya biryara vekişînê bisekine." Li gorî zagona navnetewî, serokên dewletan bi gelemperî xwediyê biryara vekişînê ne, eger peyman destûra vekişandinê bide. Lê belê, zagona Amerîkî ne gelekî zelal e, çendîn serok bêyî erêkirina Kongrêsê ji çend peymanan vekişiyane, di nav de vekişîna Trump ya 2020'an ji Peymana "Ezmanên Vekirî" ku 35 welatan di nav de digire û destûr dide kontrola çavdêriyê yên bêçek li ser dewletên endam, pêkwere. Eger mijar di dadgehê, bi cih bibe û nerazîbûneke dijberî biryara Trump were, dê ew biryar rastî astengiyên mezin were. Dadgeha Bilind a Netewên Yekbûyî ku bi gelemperî li gorî helwestên Trump di piraniya muhafezekar de biryarê dide, tu carî doza vekişîna ji peymanê li ser bingeha doza wê neneriye.

**Damezirandina NATO'yê:**

Damezrandina Hevpeymana Atlantîk a Bakur (NATO) di sala 1949'an de li ser bingeha Peymana Atlantîk a Bakur li Washingtonê hate îmzekirin. Di dema damezirandina hevpeymanê de, hevpeymanê xwe erkdar dît ku Ewropaya rojava ji Waraso û Yekîtiya Sovyetê di dema Şerê Sar de bû, biparêze. Her welatekî endam bi parvekirina amûr û hêzên leşkerî tevkariyê li hevpeymanê dike.

**Welatên endamên NATO'yê... zincîrek ji tevlîbûn û vekişîna welatan**

NATO destpêka ku hate avakirin hejmara welatên ku tevlî bûbûn, 12 bûn, di dema heyî de 32 hin ji wan endamên damezirîner bûn û yên din jî piştî damezirandina wê tevlî bûn. Di dema damezirandina wê de, Fransa, Danîmarka, Belçîka, Îzlanda, Kanada, Hollanda, Îtalya, Norwêc, Luksemburg, Îngilistan û Portekîz, ji bilî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ku li gorî welatên din ên ku di dema damezirandina wê de tevlî koalîsyonê bûn, xwedî hêza leşkerî ya herî mezin bû. Divê bê zanîn ku di sala 1952'an de welatên din jî tevlî koalîsyonê bûn, wekî Tirkiye û Yewnanistan, tevî ku Yewnanîstan di navbera 1974 û 1980'an de vekişiya, paşê Almanyaya Rojava di 1955'an de, li dû wê Spanya di 1982'an de tevlî koalîsyonê bû. Dema ku Almanyaya Rojhilat piştî ku bi Almanyaya Rojava re bû yek di sala 1990'an de tevlî bû. Piştre Macaristan, Komara Tişîk û Polonya di sala 1999'an de tevlî bûn, li dû wê Estonya, Lîtvanya, Bulgaristan, Letonya, Slovakya, Romanya û Slovenya di sala 2004'an de ku mezintirîn hevpeymanî bû di dîroka wê de. Albanya û Hirvatistanê di sala 2009'an de tevlî koalîsyonê bûn û hejmara giştî ya welatên endam gihîşt 32'an. Gelek welat ji bo tevlîbûna koalîsyonê danûstandinan dikin, wekî Gurcistan, Makedonya û Ukrayna.



**Herêmên destwerdana NATOyê:**

NATO di sala 1995'an de destwerdan di Hersek û Bosnayê de kir û hêzên (aştîxwaz) li wir bi cih kir. Hevpeymanê di sala 1999'an de ji ber pevçûna li Kosovayê êrîşên hewayî li ser Yûgoslavyayê pêkanî, herwiha hêzên xwe li Kosovayê belav kirin. Hevpeymanê di sala 2001'an de hêzên xwe şand Makedonyayê da ku qaşo aştiyê li wir biparêze. Di sala 2003'an de, hevpeymanê peywira Hêza Ewlekariya Navneteweyî li Afganistanê erkdar kir. Hevpeymanê alîkariya mirovî ji bo sivikkirina bandorên erdheja ku di sala 2006'an de li Pakistanê rûda, pêkanîn.

**Şerê Israîl-Amerîka li ser Îranê û bandora wê li ser NATO'yê**

Êrîşa leşkerî ya hevbeş ku ji hêla Dewletên Yekbûyî û Îsraîlê ve li dijî Îranê di 28'ê Sibata 2026'an de pêkhat, geşedaneke dîrokî di hevsengiya hêzên li Rojhilata Navîn nîşan da, dema ku şer ji qonaxa şerê ne yekser û operasyonên veşartî derbasî şerkeî yekser yê leşkerî yê berfireh bû. Di heman demê de pirenî bû. Şer zû sînorên Îranê derbas kir û Lubnan, Kendavê û rêyên deryayî yên girîng kete bin bandora agirê şer û ev aloziya herêmî ya herî metirsîdar yek ji tevlîheviyên herî mezin bi dirêjahiya deh salên derbasbûyî hîna wek wê rûnedabû. Operasyon bi êrîşên hewayî û mûşekan dest pê kir ku hilberîngehên leşkerî û binesaziya girîng û hestyar li hundirê Îranê hatin armancgirtin. Herwiha Tehran bersiv da bi avêtina mûşekên balîstî û balafirên bêmirov li ser bargehên Îsraîl û Amerîkayê yên li herêmê, di encamê de herêm bi giştî xist nav pêçeke agir. Rubio ku niha wek wezîrê Derve û Şêwirmendê Ewlekariya Neteweyî di rêveberiya Trump de kar dike, got ku Washington dê neçar bimîne têkiliyên xwe bi NATO'yê re ji nû ve binirxîne piştî şerê bi Îranê re ku di 28'ê Sibatê de bi êrîşên esmanî yên Amerîka û Îsraîlê dest pê kir. Di guhertina Qanûna Destûra Parastina Neteweyî de jî diyar kir ku ji bo vekişîna ji NATO'yê tu pereyên Amerîkî nayên xerckirin.

**Bangên ji bo parastina yekrêziya NATO'yê**

Seoka Meclisa Perlemanto ya Amrîkî ya berê Nansî Pelosî bi tundî hişyarî da ku encamên xirab ên vekişîna ji NATO'yê wê rûbidin. Wê gefên bi vî rengî wekî nebûna hişmendiya stratejîk û wekî xelateke nerasterast ji serokê Rûsyayê Vladimir Putin re pênase kir. Pelosi tekez kir ku desthilata ti serokekî Amerîkî maf nade wan ku bêyî erêkirina Kongrêsê Amerîkî ji vê hevpeymaniya girîng vekişin û bal kişand ser rola qanûnî ya sereke di diyarkirina rêça siyaseta derve ya Amerîkayê. Ev yek tekez dike ku dema Amerîka ji hevpyemanê xwe vekişîne dibe NATO were hilweşandin, di heman demê de ev Rûsya bi hêz bibe, di şerê li dijî Ukraynayê de bi ser bikeve. Di encama hilweşîna NATO'yê de jî dibe ku hevpyemanên nû bên avakirin ev hevpeyman jî li gorî rewşa herêmên rojava û Rojhilata Navîn bin.



Dilyar Cizîrî

## Entegrasyon, di hişmendiyê de demokratîk dibe

Ev demeke mijara Entegrasyonê bi xurtî di rojevê de ye. Bi Banga Aştî û Civaka Demokratîk a Rêber Abdulah Ocalan ku di 27'ê Sibata 2025'an de hate kirin, destpê kir. Piştî êrîşa dewleta Tirk, çeteyên wê û hikûmeta HTŞ'ê li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê û danîna peymanên di bin agir de di navbera wan QSD'ê û Rêveberiya Xweser de ev mijar hîn zêdetir bûye mijara nîqaşê.
Banga Aştî û Civaka Demokratîk entegrasyonê ji bo çar aliyên Kurdistanê pênase dike. Ev tê wateya çareserkirina mezintirîn aloziya li Rojhilata Navîn e. Ji bo entegrasyona rast pêk were, bar ne tenê li ser gelê kurd e. Di heman demê de ji dewletên xaka Kurdistanê dagirkirine di nava xwe de guhertinan çêbikin. Di Rojavayê Kurdistanê de em dinerin rayedarên Hikûmeta Demkî di daxuyanî û nerînên xwe yên derbarê entgrasyonê de wekî helandin, pênase dikin. Ji daxuyaniyên wan mirov hîs dike, ew entegrasyonê wekî teslîmbûn fam kiriye.
Ji ber dosya Sûriyê û hikûmeta wê bi xurtî bi destê dewleta Tirk tê bi rêve birin, gelek tiştên rayedarên hikûmeta demkî bêyî fam bikin, tê de gavan davêjin. Istixbarata Tirkiyê ji wan dixwaze ew jî pêk tînin. Li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê jî Tevgera Azadiyê li pey hev gava davêjin û xwe ji bo entegrasyona demokratîk amade dikin.
Lê dewleta Tirk heta niha di mijara gavavêtinê de cesaret nekiriye bi cidiyet bimeşe. Tişta tê kirin, dem bi destxistine. Tişta xuya dike dewlet di mijara gavavêtinê de li benda şerê Amerîka-Îsraîlê li dijî Îranê ye. Ev dê çawa bandorê li guhertinên nû yên di herêmê de bike, wê çi ji bo dewleta Tirk bide guhertin. Tirsa rayedarên Tirk di vê derbarê de çêbûye. Îcar di aliyekî de dixwazin xwe biparêzin, berê xwe didin mijara entegrasyonê û pirojeya Rêber Abdulah Ocalan, li aliyê din jî nikarin ji hişmendiya xwe ya nîjadperest xilas bibin.
Ji bo em mijarê baştir diyar bikin, pêwîste em li nirxandinên Rêber Abdulah Ocalan ên li ser entegrasyonê vegerin. Rêber APO di pênaseyê de dibêje nabe entegrasyon gelekî ji taybetmendiyên wî dûr bixe, Tu welat bi yek netewe, yek ziman û yek nasnameyê nayê avakirin û dibêje Ne dewlet, rêxistinbûna civaka demokratîk di pêşiyê de ye. Entegrasyona Demokratîk nayê wateya pişavtin, berûvajî wê parastina nasnameya gelan, hevjiyana azad û wekheve.
Bi nirxandinên Rêber Abdullah Ocalan pênaseya entegrasyona demokratîk zelal û diyar in. Bi riya wê dikare rê ji çareserî, demokrasî û wekheviya li Kurdistanê û tevahî welatên Rojhilata Navîn re peyda bike.
Lê heta niha dewleta Tirk û hemû partiyên wan di hişmendiya xwe de entegrasyon nas ne kirine. Ji ber wê û ji ber destê wan ji desthilatdariya wan a sedsalê nabe, nikarin gavan bavêjin. Nikarin zagonan derbixin û rê ji aştî û demokrasiyê re vebikin. Ev di heman demê de ji bo Sûriyê jî derbasdare. Ew entegrasyona li vir jî asteng dikin. Îcar heger dewleta Tirk û hikûmeta demkî ya Sûriyê di mijara entegrasyonê û pênaseya wê de bi cidiyet gav ne avêtin, dê zirareke mezin di serî de li xwe û li tevahî herêmê bikin. Entegrasyona Demokratîk di vê demê de ji bo herêmê tekane derman û çareseriye.



# Li Kobanê tevî lihevkirinê, dorpêç û êrîş

Rojnemevan Hêvîdar Heranî diyar kir ku dorpêça li ser Kobanê aloziyên mezin derxistin û wiha got: "Gelê Kobanê dixwaze bi xwaseriya xwe jiyan bike û mudexeleyên ji derve qebûl nake."

Stêrk Mihemed/Kobanê

Bi êrîşa hikumete demkî li ser Dêr Hafir, Reqa, Tebqa û hwd re di 18 çileyê Kobanê ji aliyê hikumeta demkî ve bi temamî hate dorpêçkirin, bi dorpêçkirina Kobanê re rewşa jiyanî û ewlehiyê kete nava metirsiyê. Gelek gundên Kurdan yên li Kobanê rastî êrîşê hatin û de encamê de sivîl birîndar û Şehîd bûn. Sûtemenî, pêdiviyên jiyanê û ya zarokan li kobanê qût bûn û hikumeta demkî ya Sûriyê rê li pêşiya pêdiviyên sereke ya sivîlan venedikir. Herwiha ji ber serdestkirina Bendava Tişrînî û Pira Qereqozaqê ji aliyê hikumeta demkî ve elektirîk, intirnêt û av bi temamî li ser gelê Kobanê hate qûtkirin. Rewşa jiyanê li Kobanê xereb bû ji ber sermanya zêde û nebûna mazotê zêdetirî 5 zarokan jiyana xwe ji dest dan. Herwiha ji ber ketina hikumeta demkî ji gundên Kurdan re gelek kes ji mal û gundê xwe koçber bûn û derbasî navebda bajarê Kobanê bûm. Di heman demê de koçberên ku di dibistana de diman bi zehmetî û aloziyan re rû bi rû man. Li gorî hemû êrîşan, dorpêçkirinê û kêmbûna pêdiviyên jiyanê gelê Kobanê li hember hemû zehmetiyan berxwedaniyek ku wê care duyemîn di dîroka têkoşîna gelê Kobanê li hember êrîşan were nivîsandin. Gelê Kobanê bi sekin û îradeya xwe ya xort dîrok dubare kir, di 2014'an de gelê Kobanê li hember DAIŞ'ê têkoşîna jiyan û mirina zihniyeta DAIŞ'ê da meşandin. DI 2014'an de şervanên YPJ û YPG'ê di heman demê de gelê Kobanê li hember hêza herî xeter di cîhanê de şer kir, liberxwedan û DAIŞ di kobanê de têk birin niha jî careke din gelê Kobanê û şervanên QSD'ê bi berxwedanî û îradeya xwe ya xort çeteyên hikumeta demkî bi alîkariya dewleta Tirk a dagirker têk birin.



Di 29'ê Çileyê de di navbera Hêzên Sûriya Demokatîk (QSD) û hikumeta demkî a Sûriyê de peymanek hate îmzekirin, gelek bend di vê peymanê de hatin erêkirin yek jî wan bendan bidawîkirina dorpêçê li ser Kobanê bû. Lê belê, li gorî lihevkirinê jî dorpêç li ser kobanê nahat rakirin û rê li pêşiya derbaskirina alîkariyên mirovî nehatin vekirin. Gelê Kobanê ji 18'ê Çileya ve heya vê kêliyê di nava dorpêçê de ne. Çiqas ku were gotin lihevkirin hatiye îmzekirin jî, lê dîsa gelê Kobanê nikare bi awayekî azad tevbigere û hemû pêdiviyên xwe bînin. Mînaka herî ber bi çav û zindî di 2'ê Nîsanê de dema ku şaredarî, gel û Rojnemevanên Kobanê derbasî gundê Çelebiyê bibin da ku paqij bikin û Rojnemevan karê xwe bikin rastî êrîş û neqebûlkirinê ji aliyê hikumeta demkî ve hatin, gule di ser serê gel re avêtin û hewaldan ku teknîkên Rojnemevan ji destê wen bigirin da ku vê rastiyê û êrîşî ji raya giştî re pêşkêş nekin.
Di wê demê de hate xuyakirin ku hikumeta demkî rasterast li hember vê lihevkirinê tevnagere. Herwiha hate xuyakirin ku zihniyeta hikumeta demkî a Sûriyê li beramberî Kurdan nehatiye guhertin. Ji ber vê yekê heya niha bi awayekî ku dilê gel rihet bike çarenûsa Kobanê diyar nebûye.
Di vê çarçoveyê de Rojnemevan Hêvîdar Heranî ji Rojnameya me re axivî.

**''Êrîşan jiyana sivîlan zehmet kir''**

Hêvîdar Heranî destnîşan kir ku dorpêç li ser Kobanê aloziyên mezin avakirin û wiha got: "Bi destpê kirina êrîşên hikumeta demkî li ser tevahî bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet ji Dêr Hafir ber bi Tebqa, Reqa, An îsa û Sirînê re ji 18'ê Çilêyê ve bi temamî bajarê Kobanê kete nava dorpêçeke giran ji wê roja heya roja me ya îro gelek caran alîkarî ji Heyva Sor a Kurdî, xaça spî ji bo dermanan û hwd derbas bûn. Bi vê derpêçê ji koçberên ku ji gundên re ji ber êrîşên hikumeta demkî derketine û di dibistana de cihê xwe girtine gelek zehmet bû. Êrîşan jiyana sivîlan zehmet kir. Hin koçberên ji navçeya Çeleniyê derbas bûn, lê piştî tevilheviya dawî ya li gundê Çelebiyê bi temamî koçber venegerîne. Bi ketina koçberan ji dibistanan re bi temamî dibistan bajarê Kobanê û gundewarên wê hatin rawestandin. Cûreyên dermanan gelek kêmbûn û di peydakirina wan de gelek zehmetî hebûn. Nexweşxaneyên ku bi riya sûtemeniyê xebat dikirin, bi zehmetiyan re rû bi rû man. Xeterî li ser kesên bi nexwaşê şekir zêde bû ji ber ku dermanê ensûlîn bi temamî qût bû. Ji ber dorpêçê kobanê bê mazot ma, bi taybet di demsala zivistanê gelek sar bû zarok ji ber sermanyê bi nexwaşiyan re rû bi rû diman. Gelek koçber cih tunebûm ku lê bi cih bibib, ji ber vê yekê di erebeyan de diman.

**''Hêzên hikumeta Şamê êrîşî gel kirin''**

Rojnemevan Hêvîdar Heranî axafrina xwe wiha qedand: "Di 31' Adarê de şaredariya navçeya çelebiyê piştî êrîşan dest bi xebatê kir. Di heman demê de şaredariya bajarê Kobanê xwast ku derbasî gundê Çelebiyê bibe û paqijiyê bikin. Herwiha piştî wê di 2'ê Nîsane de careke din şaredariya Kobanê serlêdana Çelebiyê kir ku dîsa careke din şaredariya çelebiyê bikeve xizmeta gel, lê hêzên hikumeta Şamê êrîşî gel kirin û rê li pêşiya raghandinê venekirin ku dengê rastiyê derxînin û bixebitin. Bi lêdan, êşkence û berdan guleyan da ku nehêlibin gel derbasî navçeyê bi xwe bibe. Lê li beramberî wê gel tekez kir ku çiqas zehmetiyan bibînin ewê bixwe şaredariya bi dest xwe avabikin ku ji gelê Çelebiyê be û li gorî hilbijartinan were erkdar kirin, lê hikumeta Sûriyê vê yekê diyar dike ku ne li gorî xwasteka gel, lê belê li gorî xwe kesan erkdar dike gelê Kobanê jî ev yek qebûl nekir. Heya niha jî ev pirsgirêk tê jiyankirin gelê Kobanê bi xwaseriya xwe dixwaze jiyanbike mudexeleyên ji derve qebûlnake."

# Malbatên dîlgirtiyan: Em zarokên xwe dixwazin

Aryen Hesen/Qamişlo

**Malbatên dîlgirtiyan diyar kirin ku zarokên wan ji bo parastina gelê xwe û di ber welatê xwe de hatine dîlgirtin û wiha gotin: "Em daxwaza berdana zarok, bira û hevalên xwe dikin."**

Dîlgirtiyên QSD'ê ku di şerê di navebera Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û hikumeta demkî a Sûriyê de hatine girtin, zêdetirî sê mehane ev dîlgirtî di zindana hikumeta demkî de ne. Piraniya dîlgirtiyan li Dêr Hafir, Reqa, Tebqa, Dêrezor û Helebê hatine girtin. Heya niha jî gelek malbat çarenûsa zarokên xwe nizanin.
Di 29'ê Çileya 2026'an de hevpeymanek di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û hikumeta demkî a Sûriyê de hate îmzekirin. Yek ji xalên sereke ya vê peymanê berdena dîlgirtiyan di navbera herdu aliyan de bû. Li gorî vê û di çarçoveya pêkanîna vê lihevkirinê de zêdetirî 500 dîlgirtiyên QSD'ê ji aliyê hikumeta demkî ve hatin berden. Li beramberî wê jî QSD'ê dîlgirtiyên hikumeta demkî berdam. Li gorî vê jî hîn di zindana hikumeta demkî de zêdetirî 600 dîlgirtiyên QSD'ê hene ku çarenûsa wan ne diyare. Hikumeta demkî ji bo berdewamkirina benda berdana dîlgirtiyên dîtir gavên piratîkê navêje û berdana dîlgirtiyan paş dixe. Bi sedan ji malbetên dîlgirtiyan çarenûsa zarokên xwe nasnakin û li benda agahiyeke ji wane. Dayîk, bav, hevjîn, zarok û hevalên dîlgirtiyan her roj di kolanena û dengê daxwaza zarokên xwe bilind dikin. Ev sê mehin malbetên dîlgirtiyan di nava êş û daxwaza zarokên xwe de jiyan dikin.
Di vê çarçoveyê de malbatên dîlgirtiyan û dîlgirtiyên ku hatiye berdan ji Rojnameya me re axivîn.



Behiya Elî

**'Kurê min ji bo gel û welatê xwe hat dîlgirtin'**

Dayîka dîlgirtiyekî ya bi navê Behiya Elî diyar kir ku kurê wê li Dêr Hafir hatiye dîlgirtin û wiha got: "Navê kurê min Ehmed Mihemd Elî ye, kurê min li Dêr Hafir kar dikir, ji 17' Çile de telîfona kurê miin hate girtin û me tu agahî derbarê wî de nebhîstin. Tenê em dizanin ku ew li cem hikumeta demkî dîl e. Ez kurê xwe dixwazim, lawê min ji bo gel û welatê xwe hat dîlgirtin. Ez dayîka şehîdekî me, ev kurê min tenê maye ew jî hate dîlgirtin. Em ê her roj derkevin kolanan û daxwaza dîlgirtiyên xwe bikin, em ranawestin heya hemû dîlgirtiyên me bên berden. Banga min ji hemû kesên têkildar re ku xwedî li van dîlgirtiyan derkevin, em nema karin dilê me dişewite."



Sîdra Ehmed

**'Ez birayê xwe dixwazin'**

Xwişka dîlgirtiyekî ya bi navê Sîdra Ehmed destnîşan kir ku ew cihê birayê xwe nizane û wiha pê de çû: "Navê birayê min Zagroz Qamişlo ye, li Dêr Hafirê hate girtin, ev zêdetirî sê mehana agahiyê me ji birayê min tune ye. Dayîk û bavê min bi şev û roj di nava agir de jiyan dikin. Kezebê hemû malbatên dîlgirtiyan tê şewtandin, ne remezan, cejin û Newroz ji bo me kêfxweşî bû ji ber ku birayê min ji me dûre. Ez birayê xwe û hevalên wî dixwazim bese êdî bese bila van esîran berdin. Ev çend caran dibêjin wê esîr werin berdan, lê hertim tê paşxistin. Em banga li dikin ku dosya dîlgirtiyan neyê paşxisitin."



Beşar Îbrahîm

**'Di zindanê de bi me re digotin bi kurdî neaxivin'**

Dîlgirtiyê ku hatiye berdan ya bi navê Beşar Îbrahîm da zanîn ku ew li Dêr Hafirê hate girtin û wiha domand: "Ez di meh û sê rojan di zindana hikumeta demkî a li Helebê de mam. Di zindanê de êşkence û lêdan hebû ji ber ku em Kurd in, ji me re dihat gotin ku bi kurdê neaxivin. Zêdetirî 500 havlên me di zindanê de ne. Hevalên min gelek name bi me re şandin ku em bi fermandarê xwe gihînin. Ez 19'ê meha Adarê ji zindana hikumeta demkî derketim. Ez dixwazim ku hemû hevalên me werin berdan ji ber ku di zindanê de êşkenca gelek girane, dive hemû dîlgirtî bi awayekî lezgîn ji zindanên hikumeta demkî werin berdan."

Bîra Civakê



Ehmed Hesen

## Diyardeya kuştina mirovan di civaka Sûriye de zêdetir dibe

Ji çaxa ketina rêjîma Baasê û heta roja îro em dibînin ku di nava civakên Sûriye de diyardeya kuştina mirovan û tolhildana ji hev du gelekî zêde bûye, taybet di bin sedemên rûmeta hev du talankirin, dizî, tewanbarî û hwd de mirov tên kuştin, binçavkirin û windakirin, ev yek bi serê xwe şerekî veşartî ya di nava civakê de tê meşandin, di heman demê de rewşa beredayî, valahî û bêewlehiya ku Sûriye di serdema sîstema nû ya Şamê de jiyan dike di astên xwe yên herî bilind de ye. ev kiryar jî hemû di bin navên ku şane û bermahiyên rêjîma Baasê dikin de tên rewakirin û ji dadgehkirinê bêpar dimîne. Ji bilî komkujiyên ku hatine serê gelê Elewî û Durzî, rojane mirov di bin sedemên ne diyar de rastî kuştin û binçavkirinê tên, di heman demê de bi dehan jinên Elewiyan jî rastî îşkence û tecawiza bi darê zorê hatine, li gorî daneyên Neteweyên Yekbûyî tenê di sala 2025an de li Siwêdayê 1700 kes rastî kuştinê hatin ku piraniya wan jî ji gelê Elewî û Durzî ne, her wiha nêzî 155 hezar kes ji cihê xwe koçber bûn û ji kuştinê reviyan, ji roja ku ev bûyer li Perava Sûriye û Siwêdayê qewimî û heya roja îro ev sînaryo li deverên Sûriye her tim dubare dibin û zêde dibin, di heman demê de çi kesên ku van sûcan di derheqê civaka Sûriye de dikin heta niha jî serbest in û bê dadgeh tevdigerin. Li aliyê din weke her car hikûmeta Şamê behsa pêketina bermahiyên rêjîmê dike, binçavkirin zêde dibin, komên bi ser hikûmetê ve binpêkirinên herî mezin di derheqê xelkê de pêk tînin, wisa lê hatiye ku gelê Sûriye di nava daristaneke bê pîvan û zagon de tevdigere, ev rewş hem aramiya civakê têk dibe, hem jî rê nade ku penaberên Sûriye bi rihetî vegerin ser axa xwe, ya rast divê di serî de rêz ji hemû etnîk, ol, rêgez û rengên civakên di Sûriye de bi awayekî durist were kirin, di van demên dawiyê de taybet ji bo kurdan hinek giştîname derketin, erênî bûn, lê ji bo dabînkirina mafên giştî yên kurdan û pêkhateyan ne têrker in, heta niha behsa hembêzkirina hemû civakên Sûriye di nava destûra nû de nehatiye kirin, ger tê kirin jî, lê li ser rûyê erdê tu guhertin pêk nayên, diviya bû ji destpêkê de şerê pêkhateyan nehatiba kirin û ev sorkirina li dijî wan bihata sînordarkirin, lê heta roja îro jî çawa li dijî Durzî û elewîyan kirin, li dijî kurdan jî, li Efrîn, Serê kaniyê û Helebê tê pêkanîn. Heta çaxa ku vegera koçberan li Efrînê jî pêk tê, em dibînin hinek erebên hawirde dev diavêjin wan û gotinên ne layîq dibêjin, ev feraseta dijminahiyê heta ku neyê sînordarkirin û rawestandin, wê xeteriya şerê navxweyî her tim bidome, divê di serî de parastina mafên mirov ên jiyankirin û hemwelatîbûnê bi awayekî tekûz were misogerkirin, heta ku karibin di Sûriyeya nû de aram jiyan bikin. Ev yek jî bi xurtkirina ewlehiyê û hevgirtina gelê Sûriye pêk tê, nexasim divê ev rewşên kuştin û revandina mirovan ku di bin navên cuda de tên meşandin bi awayekî yasayî werin sînordarkirin, sorkirina gelan li dijî hev du nakeve berjewendiya civaka Sûriye, berovajî wê her ku diçe kirîz û qeyran firehtir dibin û hêzên dagirker dikarin bi rihetî destwerdanê bikin.